



# Armananc

Dagere rojnemeya pêşi ya Kurdî  
Wîqadê Mihed Bedirxan

HEJMAR/NO: 177, NÎSAN/APRIL 1997, BUHA/PRICE: 20 SKR, 4 DM



Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê Dr. Sadiq Şerefkendi(yê milê çepê) û berpirsiyarê Partiyê yê Ewrûpayê Fettah Abdulla(yê ortê), berpirsiyarê Partiyê yê Almanayê Humeyan Ardelan di 17-ê Îlona 92-an de li Berlinê di restoranta "Mykonos" de hatibûn qetilkirin.

## "Wê jî em ê damezirînin"

"Xwiya ye ku wê ordiya ku heta niha çî rapor û projeyên li ser pîrsa Kurdî an ya »Anadoluya başûrê rojhilat« derketin, êrîş birin ser hemuyan, niha biryar daye ku programê vê pîrsê bi xwe jî ew amade bike. Ji xwe ev çend meh in ku di riya Konseya Ewlekariya Milî re ew, hukümet, parlement, dezgehên dadmendî û rêxistinên civakî hemûyan îdare dikin, niha dest avêtin vê pîrsê jî. Çimkî eşkere ye, ji ber ku yên welat îdare dikin generalên ordiyê ne, yên biryara dawîn li ser rê û dirbên çareseriyê didin ew in û ew wekî her meselê di vê meselê de jî teklîf û pêşniyariyên ku werin tehemul nakin ku ew pîrs bîn munaqesekirin.

Rûpel: 3

## Biryara dadgeha Almanayê:

# "Dewleta Îranê tawanbar e!"

Serokdadmendê Dadgeha Eyaleta Bilind a Berlinê Frithjof Kubsch di 10'ê Nîsan a 1997'an de biryara dîrokî ya Dawaya "Mykonos" ji raya giştî re eşkere kir. Dadgeha Berlinê li ser vê bûyara "Mykonos"ê bi teferrûat rawestiyabû; piştî 247 celseyan, bi gelek lêkolîn û lêgerînan û bi îfadeyên 176 kesan gihaştibû wê baweriyê ku di kuştina Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê Dr. Sadiq Şerefkendi(Dr. Said) û berpirsiyarê Partiyê yê Ewrûpayê Fettah Abdulla, berpirsiyarê Partiyê yê Almanayê Humeyan Ardelan û tercûmanê

wan Nûrî Dehkurdî de tiliya dewleta Îranê heye û ji aliyê vê dewletê ve ev kes hatine kuştin. Ji bo wê jî dadgeh cezayên giran dan wan kesên ku beşdarî vê qatlimê bûne; Kazim Derabî û Abbas Rhajel(ku eslê wî Lûbnanî ye) bi cezayên muhebedê, Yusûf Amîn (ew jî ji Lubnanî ye) 11 sal û Muhamed Atris jî 5 sal û 3 meh cezayên hefsê wergirtin.

Rûpel: 5



### NAKOKIYA ÎSLAMÎST Û KEMALÎSTAN

Halim Can di 'Ramana' vê hejmarê de li ser nakokiya ku di navbera Îslamîst û Kemalîstan de rû daye radisweste û dinivîsîne, ku" Kurd ji Kemalîzmê pir eş kişandine, lê partiya ku îro li ser hukim e ew jî dijî demokrasî û mafê mirovî ye û ji bo çareserkirna pîrsa Kurdî tiştêkî pêşkêş nake."

Rûpel: 4

### KEWNAME

"Li hemî peyvên û li hemî heyvanên dîroka xwe bizîvir û serê xwe berbi kavilan de bilind bik, da ku di wê gumanê de hemî guman bilerizin û hişê kevîran bi mîrxasî di ser dev re biçê, da ku lîlandin zuha bibim, û şehîd poşman bibin, û bawerî talan bibin û welatperwerî lal bibin û çiya hew qal bibin."

Rûpel: 11

### GRAFÎKÊN SERHAD

Wêneker û nivîskarê Yûnanî Kostas Laxas li ser grafikerê Kurd dinivîsîne, ku" Serhad, wekî wêneker û grafiker xwediyê armanc û îdealekî ye. Di berhemên wî de bi tevayî kolona jiyane û mirovên ku bi nîjada xwe serbilind in hene. Grafîkên wî kerektera jiyana hemwelatîyên xwe bi zelalî îfade dikin."

Rûpel:12-13

# "Ez pîrozbayiya we dikim"

**H**evalên hêja; hejmara 175-176 rojname we ket destên min. Ez pîrozbayiya we dikim. Bo derxistina ew hejmara taybetî li ser bîranîna Komara Kudistanê, ne-maza zehmetiyên ku kak Avcî û kak Ciwan bo wergerandina basan kişandine cihê sipas û qedrê ye!

Wekî di sergotar de jî hatiye qeyd kirin Komara Mihabad pêşîneyek dirokî ya tev Kurdan e, û ev pêhesyana we ku li ser komar bi Kurmancî binivîsin bixwe baştirin belge û nîşana wê tiştê ye.

Mixabin di wê hejmarê de hinek kemkuri (şaşî) hene ku ez di wê nemeya xwe de bala we dikşînim ser wan, heke mecal hebe wan rast bikin, ew karek baş be.

1- Nuxta yekem li ser navê Qazî Mihemed'e. Peyva Qazî peyvek Erebi ye. Dengê /Z/ di sistema fonetîka Kurdî ( Kurmancî û Soranî ) tenê dengê /Z/ heye, lê di zimanê Erebi de çar konsonanta /Z/ hene.

Ew peyvên Erebi ku di Kurdî de tînen bikaranîn bi awayek tebiî jî aliyê Kurdxev wan re li gor nîzama fonetîka Kurdî tînen telefuz kirin, yanî em Kurd çar konsonantên /Z/ cihê yên Erebi yek cor bi lîv dikin. Li hemû Kurdistanê bi Qazî Mihemed bi Erebi dibêjin Qazî Mihemed, loma nivîsîna Qadî Mihemed ne rast e.

2- Ew belgeyên Sovyetî jî aliyê Efrasiyan Helîmî jî Rusî we hatine terceme kirin, heq ew bû ku navê werger bê qeyd kirin.

3- Nivîsa Abdulah Merdux di redaksiyona Gzînge de bûye sebaba munaqeseyan. Ew tenê ji bo hurmet li demokrasîyê hatiye bilav kirin, piraniya gotinên wî bêbingeh û bêbelgen e.

Ew dibêje ku Komeley Jîyanî Kurd (Jîyanewey Kurd ne rast e) Liqek jî komeleya Hîwa, bûye wekê din li ser Qazî Mihemed jî ne pozîtîv e.

4- Di wan resman de ku di rûperên 22 û 23 de hatine çap kirin çend şaşî hene.

a) Li jêr resma Mela Mistefa û gerek wilo bê nivîsîn! Serheng (kolonêl) Elî Ekber Xefarî, Mistefa Barzanî, Mîrhac Ehmed û Ezzet Ebdulêzîz.

b) Li bin resma Mihêdîn Maweranî de hatiye nivîsîn Mahmûdê Eladîn çima?! Ew du resmên di kitêba Xenî Blûryan Alekok de hatine çapkirin.

5) Di rûpera 27-an de resmê Serleşkir Rezmara û Serokêşîrên Kurd- ku li dij Komara Kurdistan tewir girtin hatiye çap kirin. Di wê resmê de Ebdula Elxanzade jî heye ku bi aşkere û vekirî ji sitada ertêşa Îranê re kar dikir.

6) Resma rûpera 30 lê Senendec Kurd dibêjin (Sine), nehatiye girtin ew resim li meqera Hizbî Demokrati Kurdistanî Iran Li Saqiz hatiye girtin. Ew resim di çend kitêban de hatiye çap kirin.

7) Di rûpera 30 de derheqa nav û wezîfa karbedestên Komarê de çend şaşî hene.

a) Hajî Babe Şêx ( Şêx Baba şaşê) ew serokwezîr an Reîsa heyetî milî bûye

b) Muhemmed Husênî Seyfî Qazî alîkarê serokwezîr na, lê alîkarê serokcumhûr (komar) bûye.

c) İlhanîzade şaş e, Elhanîzade rast e

d) Ehmedîyan şaş e, Ehmedeyn rast e

e) Hacî Mistefa Darî şaş e, Hacî Mistefa Dawudî rast e

f) 18) Hermînî şaş e, Hêmin rast e

g) Êmer Xan Şîkaki hem rast e, hem şaş e şîkak nava konfêdrasyona Êşîretane ev Konfêdrasyon jî çendî Êşîran pêk hatiye mîna Evdoyî, Mamedî, Henare, Kerdar.. Emer Xan Şerîfî rast e.

Heq bû di wexta nivîsîna navên serdar û serokên leşkerî yên berpirsiyar ew navên jêrîn bînen qeyd kirin. Mihemed Nanewazade

(Serokê heza navendî)

Mistefa Xoşnaw, Êzet Êbdulêzîz, Bekir Hewêzî, Xeyrula Êbdulkerîm, İbrahim Selah, Mihemedî Ratîbî ( Hemedî Mevlûdî)

Li ser navê Êşîran hinek şaşî hene.

4) Begzadeyî şaş e Begzade rast e

5) Geylanî ( ne êşîret in ) Şêxên Neqşben-diyên Nerî (Şemzînan in)

6) Êşîra Zaza şaş e, Zerza rast e.

7) Karapapakî şaş e, Qerepax rast e.

8) Mameşî şaş e, Mameş rast e.

Êbdullah Kadîrî şaş e, Êbdula Qadirî rast e Nalûs şaş e, Nelos rast e.

9) Pîranî şaş e, Pîran rast e.

Karenî Axa şaş e, Qerenî Axa rast e.

10) Minqûrî şaş e, Mengur rast e.

11) Serdeşî şaş e, Gewrik û Serdeşt rast e.

Kek Ala şaş e, Kakela rast e.

12) Keworkê şaş e, Gewrik rast e.

16) Deburgiyên Mehabadê şaş e., Dê-bokriyên Mehanadê rast e.

18) Feyzulbegî rast e û Begên Bûkan û Sakîzê Feyzulla şaş e.

Êşîreta "Begzadeyên Feyzulabegî" li derûdora Bokan û Seqîz rûdinên piraniya serokên wan hewalbnedê komar bûn, hejmarek jî wan piştî ruxana komarê li Saqîzê hatin dardirin Ehmed Xanî Faruqî û dubirayên wî li Saqîz û Elî Begî Şêzad li Bokan.

19) Sahandîzê şaş e, Şahîndej(bi Farisî) û Sayîngela(bi Kurdî) rast e.

8) Di listeya navên kitêbên li ser Komara Mahabadê(Kurdistanê) de çend şaşî hene.

Necf Qulî Besyan şaş e, Necf Qulî Pêşyan rast e.

Kitêbek herî girîng ku di sala 1993-an de hatiye belav kirin: Ew jî kitêba Nuşîrwan Emîn e ku di jêrnota rûpera 12-an de îşareya wî hatiye kirin. Navê kitêbê wisa ye: Hukûmetî Kurdistan, Rêbendanî 1324-Sermawazî 1325, Kurd le gemey Sovyetî de, Neuşîrwan Mistefa Emîn, Utrecht-Holland, 1993.

Hêvî dikim ev tîbîniyên min bi dilek fireh û vekirî werbigrin.

Hesenê Qazî

## Armanc

Rojnameya Kurdî  
ya mehane  
&  
Monthly Kurdish Magazine

Hejmar, No: 177

Redaktorê berpirsiyar  
Mûrad Ciwan  
Tel: 063-87358  
E-Mail: M.Cilgin@pocob.se

Redaksiyon  
Mumtaz Aydin  
Faris Can  
Nihat Eli  
Ehmed Huseynî  
Hesen Mizgîn  
Emîn Narozî

Layout/pergela rûpelan  
F. Can

Nûçegihan  
Yakup Karademîr • Stenbol  
Tel:212-5306524  
Faks:212-5306473

M. Saît Alpaslan • D.Bekir  
PK 303, 2100 Ofis  
Diyarbakir

M. Alî Karaaslan • Almanyaya  
Tel.49-6441-42336  
Fax.49-6441-43295

Teyîb Alan Kolçî • Fransa  
Tel/Faks: 33-1-44630735

Şertên abonetiye  
Abonetiya salekê  
Skandinaviya: 250 SEK  
Ewropa: 60 DM  
Derveyî Ewropayê: 50 \$

Prenumeration  
maqam/myndighet  
450 SEK

Anons / İlan  
Niv-rûpel-en halv sîda  
2500 SEK, 500 DM

Adres:  
Box: 15216  
161 15 Bromma  
Sweden

Tel: +46-8-803135  
Faks: +46-8-801825

Hesab:  
Postgiro: 4972255-6  
Sweden

Ji bo aboneyên  
Almanyayê  
M. Alî Karaaslan  
Dresdner Bank – Giessen  
Konto: 8 838 847 00  
BLZ: 513 800 40

Utges av  
Kurdiska Kultur Huset  
Ansvarig utgivare: M. Marsil

ISSN: 0348-7385

Tryck: APEC

### Ji bo Armancê

**D**i hejmara 171-172 (13-14) an ya rojnameya we de nivîswekê Evîndarê Farqînî bi navê "Nivîsakrî urustiyê divê" hat weşandin. Di vê nivîsê de E. Farqînî rexneyên xwe li ser şend nivîs û wergerên A. Gernas yên ku di van demên dawiyê de hatibûn weşandin, diyar dike. Her weha di wê nivîsê de, ez tim bi navkirin ku xwedîgiravî heqê min hatibe xwarin. Lê rastî ne weha ye, ji ber ku;

1. Ez ne wergêrwan im. Tevî ku zimanê Erebi û Polonî dizanim, lê nayê wê mahneyê ku ez ji wan zimanan karibim nivîs wergerînim bo zimanê Kurdî. Min bi Erebi û Polonî xwendiyê lê mixabin bi Kurdî nexwendiyê.

2- Ew wergerin li ser muzîkê û folkorê ku hatine weşandin, ez û A. Gernas bi rojan rûniştine gotin bi gotin, hevok bi hevok li ser xebitîne.

3- Em bi Kurdî dibêjin, " Xwar rûnê lê rastiyê bibêje" û rastî jî weha ye.

Eger ev wergêr li benda tembeliya min bîmana tucar nedigigan destê xwendevanan. Keda ku A. Gernas ji bo ewergêr û weşandî-



Armanc  
Box 15216  
161 15 Bromma  
SWEDEN

na wan rijandiye, eger ji keda min ne zêdetir be ne kêmîr e. Û ji ber wê yekê jî ez bawer im ku mantiqê însafê dibêje ku mafê A. Gernas heye ku navê wî jî li tenîştaya yê min di bin wan wergêran de heb.

Ez di wê baweriyê de me, ji bo ku rexnegirtin objektîf be û rolên xwe yê pozîtîv bi cî bîne, divê ku bîngê wê fakt bin. Û wer diyar e ku hevalê me E. Farqînî lêkolîn i ser van faktan nekiriye û ji ber wê jî, min xwest vê nameyê ji we re birêbikim da ku hîn rastî ronî binin ji ber ku ..."nivîskarî durustî divê".

Di xweşiyê de bimînin.

XWEŞNAV

### Radyoya Mizgîniyê

#### Li Ewropayê

Hera Şemiyê êvarê di navbera  
seat 20.45 û 21.00-ê de li ser  
pêla navîn(MW), 1395 kHz.

#### Li Tirkiyeyê

Her roja Şemiyê û Yekşemê çvarê  
di navbera seat 21.45 û 22.00-ê  
de li ser pêla navîn(MW), 864  
kHz.

#### Radyoya Mizgîniyê

P. K. 1125  
354 41 Biebertal, Almanyaya

### FİSA ABONETIYÊ

## Armanc

SWED: Armanc, Box 15216, 161 15 Bromma – SWEDEN  
Postgiro: 4972255-6, SWEDEN • 250 SEK/sal

ALMANYA: M. Alî Karaaslan, Dresdner Bank – Giessen  
Konto: 8 838 847 00 • BLZ: 513 800 40 • 60 DM/sal

TIRKIYE: Yakup Karademîr, Akbank T.A.Ş., 142 Aksaray – İSTANBUL  
Hesab no: 0017880-6 / BU6 / 01 • 400 000 TL/sal

Aboneyên Ewropayê abonetiya xwe li ser hesabên Ewropayê bişînin û yên li welatî jî li ser hesabê welatî bişînin.

#### NAV Û PAŞNAV

#### ADRES:

#### PEREYÊ DAYÎ

**C**irokê pakenî ya li ser Seddam Husên heye. Bi hêviya ku hînekan ji we nebihîstibe, min divê ez bi wê çirokê dest bi nivîsa xwe bikim.

Dibêjin ku di dema şerê navbera Îran û Iraqê de bû. Heşt salên şerî çûbûn bêtir ku aliyek serkeftineka berbiçav bidest xe. Ji her du aliyên jî bi milyonan însan miribûn û bêhed gund û bajar wêran bûbûn. Dawiya dawîn Seddam Husên mecbûr ma, gazî hin dîplomatên xwe kir, xwest wan bişîne nik Ayetullah Xumeynî da ji bo aştî û li hevhatinekê pê rûnên.

Got:

—Herin Eyetullah Xumeynî bibînin bêtir, serokê me aştîyê dixwaze ka ji bo aştîya navbera her du welatan şertên we çî ne, em amade ne rûnên wan şertan muzakere bikin.

Heyeta diplomatan rabû, çû Îranê, çend rojan ma û vegeriya Iraqê, derket huzûra Seddamî. Serokê heyetê hedî hedî rabû ser xwe û bi tirs dest bi axaftinê kir, got:

—Ya serokê payeberz, em çûn me Xumeynî dît. Wî jî divê em dawî li vî şerê bêencam binin û li hev bîn. Lê ji bo aştîyê hin şertên wî hene.

Sedamî meraq kir, pirsî:

—Çî ne gelo? Ka bejin!

Serokê heyetê dest pê kir, şertên Xumeynî jimartin:

—Xumeynî dibêje ew girava ku li nava Xelîcê ye di eslê xwe de ya me ye, divê hûn wê bidin me.

Seddamî got:

—Baş e, xem nake.

—Piştî, ew hûdûdê navbera me û we bi peymanê Cezaîrê bîzzat ji alî Şahê me û Seddamî ve hatibû qebûlîkirin. Divê hûn wê ahda xwe neşkinin û dev ji daxwaza sererastkirina hûdûdan a ji nuh ve berdînin.

Seddamî jî wê re jî got:

—Baş e!

—Piştî, bi neheqî, yê ku dest bi şerî kir Seddam bû, we gellek zerar û ziyar daye me. Divê hûn zirar û ziyana me jî tazmîn bikin!

Seddamî dizanibû ku petrola Iraqê têra wî jî û ya Xumeynî jî dike. Loma ji wê re jî got:

MURAD CIWAN  
m.cilgin@pocab.se

## "Wê jî em ê damezirînin"

—Temam!

Piştî seroke heyetê dengê xwe nizim kir, got:

—Şertekî Xumeynî yê din jî heye, lê ne tiştêkî maqûl e, loma jî em newêrin ji te re bêtir.

Seddamî got:

—De metirsîn, bêtir. Axir em hatine qonaxeka wisa giran ku divê em guhê xwe bidin hemû teklîfan.

Serokê heyetê domand:

—Xumeynî dibêje ku şertê min ê dawîn jî ev e. Televîzyona Iraqê jî serê sibê heta êvarê programên li ser Seddam Husên diweşîne ji niha pê ve me divê ku, di şûna wê de di televîzyonê de Qur'an bê xwendin. Seddamî got:

—De hema rabin, zû herin ji Xumeynî re bêtir ku Seddamî hemû şertên te qebûlî kirine, were em li hev bîn. Dîplomatên heyetê hemî li hemberî wê bersivê mit û mat mayî li hev nihêrtin. Gava Seddamî ev yek dît, fahm kir ku ji ber qebûlîkirina wî şertê dawiyê wiha şaşmayî ne.

Loma jî got:

—Xem nake, herin wî şertî jî qebûlî bikin. Min rê jê re dîtîye. Ji niha pê ve Qur'anê jî ez ê bixwînim.

**Ev pakenî çima hat serê wê nivîsê?**

Çendekî berê gava xeberek derket ku, eskerên Tirkîyê gotine ku, li hemberî terorê em bi ser ketin, me zora terorê bir ji niha pê ve dora destpêkirina çareserkirina pirsgerêkên civakî, aborî, kulturî û hindekarî yê herêmê ne, li ser vê yekê biryar dane ku programekî ji bo van pirsgerêkan jî ew bi xwe amade bikin. Yanî ordiyê heyetek daniye ku, lêkolînê bike û pakêta çareserkirinê ya generalên Tirk pêşkêş bike.

Xwiya ye ku wê ordiya ku heta niha çî rapor û projeyên li ser pirsê Kurdî an ya Anadoluya başûrê rojhilat derketin, êriş birin ser hemuyan, niha biryar daye ku programê wê pirsê bi xwe jî ew amade bike. Ji xwe ev çend meh in ku di riya Konseya Ewlekariya Milî re ew, hukumet, parlament dezgehên dadmendî û rêxistinên civakî hemuyan îdare dikin, niha dest avêtin wê pirsê jî. Çimkî êşkere ye, ji ber ku yê welat îdare dikin generalên ordiyê ne, yê biryara dawîn li serê û dirbên çareseriyê didin ew in û ew wekî her meselê di vî meselê de jî teklîf û pêşniyariyên ku werin tehemul nakin ku ew pirs bîn munaqesekirin. Kî bi teklîfeke ber bi maquliyê were, kî pirsê

bi niyeteka dilxwaziya çareseriyê munaqesê bike, ya tê kuştin, yan merivekî wî tê kuştin ya zerar û ziyaneke dighîje mal û milken wî, îdî kes newêre bi bernamê û teklîfan were. Kes nizane ku hûdûdên qebûl û tehamula generalan li ku destpê dîke û heta ku derê diçe.

Loma jî xwiya ye ku wekî wan meseleên din ên siyasî, ên civakî û ên li ser demokrasîyê, general bi xwe wê bi teklîfêkê werin, di riya Konseya Ewlekariya Milî re wan bi hukumet û parlamentoyê bidin qebûlîkirin, piştî re wê devê însanên Tirkîyê vebe û herkes dest pê bike, bi navê munaqesê benîştê devê generalan ê genî bicû. Çewa ku îro li ser layikîyê, cumhuriyet û demokrasîyê ev benîştê çûtin.

**Ev xusûsiyeta trajîkomîk a Tirkîyê ne** Erûdaneka nû ye, ji berê de heye. Hîn wexta dewra destpêka avabûna Cumhuriyeta Tirkîyê, serokên Kemalist ên wê demê ku piştî xwe dabûn ordiyê û Tirkîyê îdare dikirin, ne dihiştin ku tu partî an hêzên siyasî yê derveyî wan, mafê jiyane bi dest xînin. Kê serê xwe derdixist serê wî difirandin. Meşhûr e, wê wextê pirsê avabûna partiyeka komunîst hatibû holê, wan nehişt ku partiyeka wiha ava bibe, çimkî dijgotin niha ne wexta wê ye, ji bo Tirkîyê partiyek wiha ne lazîm e. Heke em bigihîjin wê qenaetê ku ji Tirkîyê re partiyeka komunîst lazîm be, wê jî em ê damezirînin, ne ku komunîst. Îro jî çareserkirina pirsê Kurdî, li gorî wan ne lazîm e, heke lazîm be, ji bo wê jî ew bi xwe wê çareseriyên binin.

Sed û şest-heftê sal derbas bûne ku Tirk behsa pêşveçûna ber bi dinya medenî dikin, ev heftê û pênc sal in ku li ser avabûna cumhuriyeteke nû tê muhewelekirin niv qirn e ku behsa bicîhkirina demokrasîyê tê kirin. Gava meriv bala xwe dide van qonaxên han, bi xemgînî û mixabinî diyar dibe ku; hin tişt hene ku ew li Tirkîyê qet neguherîne wek xwe mane, hê gellek salan jî wê wek xwe bimînin. Ew jî; durûtî û sextekarî ne, tirsê ji rûmet û dewlemendiyên insaniyeta medenî ye.

**Daxuyaniya Komîteya Navendî ya Partiya Yekîtîya Sosyalîst a Kurdistanê (PYSK) ku bi munasebeta 1-ê Gulanê hatiye belavkirin.**

**R**oja yekîtî, hevkarî û têkoşînê ya karker û kedkarên dinyayê, 1-ê Gulanê nêzik dibe. Bi 1-ê Gulanê re, şînbûn û geşbûna xwezayê, tîn û tesîra xwe li ser jiyana civakî jî dihêle. Li hemberî zilm, zordarî, koletî û hovîtiya sermayedariyê, 1-ê Gulanê dibe rojêke giştî ya berxwedanê.

Cihana kedê di vî roja bi mane de, li ser bingehê tecrûbe û pêmayiyên xwe yê dirrokî, li dijî cihana sermayedarî û emperyalîzmê û hemû afirandinên wan yê kedxwarin, newekhevî û çewisandinê, ji bo jiyaneke serfiraz û dilşad û di riya sosyalîzmê de, doz û daxwaza xwe ya têkoşînê dixê jiyane.

Di mercên dinyê yê îro de, ku sazûmana sermayedarî û emperyalîzmê li hemberî sosyalîzma reel bi awakî muwaqet bi serketiye, nîşan nade ku sazûmana sermayedarî û emperyalîzmê rast

## "Pirsê Kurdî çareser bikin"

û mafdar e. Divê bê zanîn, ku serketina demî, wê weha berdewam neke.

"Sazûmana Dinya Nû" ya ku ji aliyê emperyalîzmê ve hatiye pêşkêş kirin, ji destpêkê de iflas kiriye. Li her aliyê dinyê, bêistiqarî her ku dihere mezintir dibe. Di serî de li welatên kevnesosyalîst ku teslîmî sazûmana sermayedariyê bûbûn, li her aliyê dinyayê têkoşîna karker, kedkar û gelên bindest geş dibe. Baweriya ku rizgariya mirovatiyê ne di sermayedariyê de ye, her ku dihere bi hêztir dibe.

Îsal jî, li Kurdistanê 1-ê Gulanê di mercên şer de tê pîroz kirin. Kevnesopiya şoreşgerî ya 1-ê Gulanê di nav têkoşîna me ya rizgariya neteweyî de dijî. Damezrandina partiya me jî vî naverokê dewlementir dike. Herweha, rashatîna damezrandina partiya me ber bi vî roja giranbiha ya navnetewî 1-ê Gulanê, serbilindiyekê dide me û daxwaza ku em li sosyalîzmê û bihayiyên kedê bêtir xwedî

derkevin, geştir dike.

Berxwedana gelê me ya li hemberî şerê kolonyalîst ku Komara Tirkîyê bi serhişkî dimeşîne, berdewam dike. Tevî wêrankirin û zaiyatên mezin yê ku li welatên me çêdibin jî, wê têkoşîna gelê me ya ji bo azadî û serxwebûnê berdewam bike. Li hemberî dîtî û şerê ku kolonyalîst didin pêş, bêtir têkoşînê tu riyêke din tune.

Di vî roja dirrokî ya 1-ê Gulanê de, em dîsa diyar dikin ku heta pirsgerêka Kurd û Kurdistanê bi awayekî adil û demokratîk neyê çareser kirin, wê li Tirkîyê û Rojhilatanaşîyêke bi rastî û istiqar neyê ava kirin.

Di vî roja yekîtî, hevkarîya enternasyonalî û biratiyê ya nav gelan 1-ê Gulanê de, ji gelên ku welatên wan kolonyalîst in; ji gelên Tirk, Ecem û Ereb re banga me ev e:

Êdî ji karbidestên xwe û ji siyaseta birêvebirên dewleta xwe ya neheq û zor-

dar re, nebin pêngav. Li hemberî şerê kolonyalîst yê xwîndar helwestê bigrin. Sazgehên dewletên kolonyalîst, kevneperest û nûjadperest yê ku îro Kurdistanê wêran dikin û dişewitînin û gelê me qir dikin; jahrê dixê nav nan û xwarina we jî. Divê bê zanîn ku heta Kurdistan û gelê Kurd azad nebe, azadiya we ya rastî jî wê pêk neyê.

Îro, riya rizgariya gelên Rojhilatanaşîyê ya rastî jî, di têkoşîna me ya hevbeş ya li dijî van zordestan re, derbas dibe. Di serî de, divê partî û tevgerên sosyalîst, şoreşger û demokrat yê gelên Tirk, Faris û Ereb xwe ji tesîra şovenîzma neteweyê serdest rizgar bikin û fonksiyonên xwe yê ji bo rizgariya gelan pêk bin. Di vî roja bi mane de, em hemû avayî û sazgehên navneteweyî yê sosyalîst, şoreşger, demokrat û mirovperwer dawetî piştgiriya têkoşîna me ya mafdar ya rizgariya neteweyî dikin.

Em bi vî bir û baweriyê 1-ê Gulanê pîroz dikin û diyar dikin, ku em dê naveroka şoreşgerî ya 1-ê Gulanê, di têkoşîna xwe ya rizgariya neteweyî de bi hêztir bidin jiyandin.

# Nakokiya Îslamîst û Kemalîstan û helwesta Kurdan

**B**î hatina Partiya Refahê li ser hukim di navbera Kemalîst û Îslamîstan de nakokiyên mezin derdikevin. Ku meriv Kurdan jî wek grûbeke cuda lê van herdu fenomenan zêde bike ev hersê fenomen herroj rojeva Tirkiyeyê tayîn dikin. Îslamîst û Kurd di cepheyên cuda de li hember vê sistama heyî ya ku li ser bingeha Kemalîzmê ava bûye, derdikevin. Partiyên mûxalefetê yên CHP û DSP ku li ser bingeha Kemalîzmê hatine ava kirin û ANAP di bin siya Erkanî Herb de siyasetê dikin li gora wan rejîma cumhûriyetê di xeterê de ye. Partiya baskê din ya koalîsyonê DYP-ê jî hemû benê xwe xistiye destê seroka xwe Tansû Çillerê. Çiller jî ji bo berjewendiyên xwe yê şexsî û sûstîmalîyên ku heta nuha kiriyê veşêre, naxwaze 'zewaca xwe' bi Erbakanî re xerab bike.

## Kemalîst-Îslamîst

Ev 70 sal in ku cara pêşîn e, koalîsyona Refahyolê ku Partiya Refahê bi dengên xelkê hatiye ser hukim û di Meclîsa Mezin de partiya yekem e; bi uslûb û îcraata xwe di sistema Tirkiyeyê de qulik vekiriyê û di şexsê wê de Îslamîst sistema Tirkiyeyê ber bi xeteriyê ve dibin. Êdî li Tirkiyeyê li gel demokrasî, azadî û mafê mirovî sistem jî tete munaqesekirin.

Di navbera Kemalîst û Îslamîstan de nakokiyêke eşkere rû daye. Civat bûye du perçe. Ji alîkî ve aligirên sekularîzmê û ji aliyê din ve jî anti-sekularîst di her qada jiyane de tèn hemberî hev. Aligirên Refahê yan jî grûbên anti-sekularîst li hember dewletê şevên cihadê li dar dixin, tiyatroyên îdeolojîk pêşkeşê sahnayan dikin, bi merasimên dînî; bi dua û selavatan avahiyan vedikin, di terîqat û dergehên de li dijî sistema heyî dengên xwe bilind dikin. Aligirên Kemalîzmê û Kemalîst jî li dijî "şerîatperestan" kampanyayên cuda organîzedikin; li gor wan divê dibistanên ku îmam û xetîban derdixin beşên wan yê navîn bèn girtin, divê dibistana bingehîn û perwerdeyê bibin 8 sal; ew jî merasim, civîn, meş û mîtingên xwe bi sirûda milî ya Tirkiyeyê "Marşa Îstîklalê" vedikin û digrin" û dibêjin cumhûriyet di xeterê de ye, dê Tirkiye bibe wek Îran û Cezayîrê. Seroktiya baskê Kemalîzmê Ordiya Tirkiyeyê dikşîne; ku ew 70 sal e, cara pêşîn e direkt û bi dengê bilind tedaxulê siyaseta Tirkiyê dike û bi wasiteya Konseya Ewlekariya Milî fermanan derdixe û pêşkeşê hukûmetê dike, dibêje; "Pirsa herî ciddî ya Tirkiyeyê îrtîca ye. Ev pirs ji cûdexwaziye jî xetertir e, divê hukûmet li dijî wê tedbîran bistîne". Hîn wezîrên hukûmetê jî ku ji baskê Partiya Çillerê ya DYP-ê ne wek leşkeran difikirin, dibêjin rejîma Tirkiyeyê di xeterê de ye û ji bo wê jî ji wezîrtiya xwe istîfa kirin. Munaqesê tê kirin ku ordiya Tirkiyeyê bi derbê tedaxula vê pêvajoyê bike. Lê mixabin hin çepên Tirk jî û serokê PKK'ê A. Ocalan jî ordiya Tirkiyeyê ordiyeke pêşverû dibînin.

## Mûxalefet xwe sipartîye Erkanî Herb

Erkanî Herb wek "Şûrê Demokles" li ser hukûmetê ye, siyaseta hukûmetê ew tayîn dike. Ji wê jî koalîsyona Refahyolê li ber ketinê ye, rojên wê jimartîne. Lê ji ber ku mûxalefet bela-vela ye ew emrê xwe dirêj dike. Partiyên rast û xwedigiravî yê ku ji xwe re dibêjin "sosyaldemokrat" di tu noqteyan de nikarin bèn ber hev, tenê tiştekî wan yê muştêrek heye ev jî ew e, ku ew di bin siya Erkanî Herb de siyasetê dikin û xwe spartîne "bextên" leşkeran da ku leşker hukûmetê bixînin.

Lê partiya Refahê partiyeke oportunist e û serokê wê Erbakan jî mirovekî populist û pragmatîst e ji bo ku li ser hukim bimîne ew tawîzan dide Erkanî Herb, lê di binê van tawîzan de jî siyaseta xwe dimeşîne û ji nimetên îktidarê sîd werdigre.

## Kurd jî Kemalîzmê pir eş kişandin


Ev 70 sal e Kemalîst li ser hukim in û îdeolojiya wê wek virûseke ketiye her derê civatê. Wek tabûyeke tu carî Kemalîzm li Tirkiyeyê nehatiye munaqesekirin û ku car carna hatibe munaqesekirin jî ev munaqesê di nav grûbên çep û Kurd yê marjînal de bûne. Ev cara pêşîn e ku bi wasiteya partiya Refahê di sekiye weha bilind de ev îdeolojî û sistema wê bi weşartî be jî tete munaqesekirin; berdevkên dewletê îtraf dikin û bi eşkerayî dibêjin ku sistema wan di xeterê de ye.

Helbet Partiya Refah û Îslamîstên din yê redîkal yê ku diwxazin vê sistemê bigehurînin ew jî bi kirin û bîr û baweriyên xwe ne demokrat in û li dijî maf û azadiyên mirovî ne û ji pirsra Kurdî re tu çareserkirîneke jî pêşkêş nakin. Ew diwxazin Tirkiyeyê ber bi şerqê ve bibin. Lê rastiyeke jî heye Partiya Refahê bi dengên gel û bi riya demokratîk hatiye ser hukim û ya herî xerab jî ev parti bingeha wê ya xurt qada Kurdistanê ye. Herçiqas Kemalîst jî Îslamîstan moderntir in jî lê Kurd jî Kemalîzmê pir eş kişandine û sistema ku li ser hîmên Kemalîzmê hatiye avakirin Kurdan înkâr, surgun û asîmle kiriyê û daxwazên wê yê "masûm" bi barbarî rawestandiyê.

## Divê ev rejîm hilweşe!

Ev guhertînen dawiyê yê dinyayê û têkçûna sistema sosyalişt jî nîşan da ku wexta sistem hildiweşin ji bo milettan rê vedibin ku ew bigihîjin mafên xwe yê neteweyî û demokratîk û dewletên xwe jî ava bikin. Bi têkçûna Sistema Sosyalişt a Sovyetê gelek dewletên serbixwe derketin ortê. Li Bûlgarîstanê Tirkên ku di salên 80-yê de dihatin înkâr û asîmlekirin piştî têkçûna sistemê îro partiya ku wan avakiriyê di meclîsa Bûlgarîstanê de partiye kilit e.

Di vê sedsala me de du şerên cihanê qewimîn, Kurd tiştek bi dest nexistin, di dema herî lawaz a cumhûriyetê de Kurd serî hildan bi ser neketin. Lê divê îro ew jî hewil bidin bi riyên aşî û demokratîk û legal beşdarî hilweşandina vê sistema ku ev 70 sal in ew înkâr kiriyê, bibin. Kurd ku bi rêxistin nikarin beşdarê vê pêvajoyê bibin, divê ew vê sistema heyî jî neparêzin. Divê ew parazgerên mafê xwe yê milî û demokratîk bin, piştigiriya wê hêzê bikin ku yê ku bi rastî dixwazin azadî, demokrasî û mafê mirovî li Tirkiyeyê bi cih bikin. Di nakokiya di navbera Îslamîst û Kemalîstan de ku Îslamîst bi ser bikevin û sistema ku ew ava bikin, dê ji Kurdan re tiştekî nû neyne, lê dê ew wek Kemalîzmê li hember Kurdan evqas şoven jî nebin!



# Ma qey çêlikên maran bêjahr dibin?

—Gelo komunîst reng guhartin?

ABIDÊ DIYARBEKIRÎ

**P**lîstî têkçûna sistema sosyalişt, hinek partiyên komunîst li Başurê Ewropaya navîn xwe guherandin ya jî bi nave xwê yê kevn, di civata nû de ciyê xwe stendin. Lê tiştekî balkeş derket ortê; ev partiyên komunîst hama hama li her derê siyasetên nasyonalîst û nijadperest meşandin û dimeşînin.

Berî nuha bi çend mehan, li Romanyayê hilbijartina giştî çebû. Partiya komunîst a kevn ya Romanyayê di xebata hilbijartinê de li hemberî minorîteta Macarî û Qereciyan propagandayek nijadperest û dijminatîyeke mezin ajot. Çaxa di sala 1989-an de, komunîstan îflas kir û rejîma wan jî ortê rabû tevgerê bi navê "Vatra Romaneasca" damezirandin. Ev tevger li hemberî minorîtetan siyasetek şovenîst ajot û gelek provakasyon li dar xistin û ev provakasyonan kirin hustiyê minorîtetan.

Komunîstê Rûs Borîs Gunko di sala 1992-an de xwe-pêşandineke bi faşîst û nasyonalîstan re organîze kir. Borîs Gunko nûnerê "Aliansa sor û qehweyî" ye. Generalê KGB Alexander Sterligov nuha serokê "Tevgera Netewiya Rûs e." Di civînan de aligirên wî gomlekên reş li xwe dikin ku bi simbolên xwe, xwe dişibînin xaca Hîtler. Ev rêxistin li Rûsyayê şovenîzmê û dijminatîya li hemberî Yahudiyan dimeşîne.

Vladîmîr Mecîar kariyera xwe di partiya komunîst a Çekoslovakayê de kiribû. Piştî têkçûna sosyalizmê ji bo ku Slovaki jî Çekîyan veqetin, wî dest bi siyasetek agresîv û nasyonalîst kir û di vê siyaseta xwe de bi ser ket.

Wezîrê Derve yê kevn ê Yekîtiya Sovyetê Eduard Şevardnadze bû serokê Gurcîstanê li hember milletên din siyasetek bi kîn û nefret ajot.

Serokê dewleta Rûsya Sipî, Aleksander Lukasjenko di dema Sovyetê de berpîrsiyarê kolhozêkê bû. Piştî jiortêrbûna sistema Sovyetê bû serokdewlatê Rûsya Spî. Lukasjenko li hember hêza Amerîkayê dixwaze Sovyetê ji nuh ve ava bike. Nêrinê Lukasjenko di derheqê demokrasîyê de wiha ye; "Almanyaya Hîtler nîşanî me da ku di îdarekirina civatê de dûzan çiqasî pêwîst e. Ev jî ancax dikane ji alî serokekî xurt de bê bi cî anîn û bi vî hawî ancax kare welatekî ji krîzê derxe."

Li welatên Balkan jî komunîst û generalên kevn, nuha li hember millet û aqaliyeten din siyasetên nijadperest, nasyonalîst dajon. Wek mînak, meriv dikane Milosoviçê Yugoslavyayê û Franjo Tudjmanê Xirwatîstanê nîşan bide.

Serokê Xirwatîstanê komunîstê kevn Franjo Tudjman di derheqê qetilkirina Yahudiyan de weha dibêje; "Yahudî jî milletên din zedetir ji Hîtler ezîyet nedîtî. Ezîyeta û qetliama ku li Yahudiyan hat kirin, wan bi xwe anî serê xwe. Yahudiyan nefreta li hemberî xwe geş kirin, çimkî wan dinê xwe yê taybetî û adetên xwe yê millî diparastin."

**K**omunîstên Tirkan, çî di dîrokê de û çî jî îro, wan tim û tim bi perspektîveke şovenîst û nijadperestî li mese-la Kurd nehîrin. Wexta Kurd di perspektîveke millî de mafên xwe yê netewî dixwazin, ji alî komunîstên Tirk ve tim mohra nastonalîstiyê li wan dikeve. Komeleya Sermiyandarê Tirkan(TUSIAD) di derheqê pirsra Kurd û demokrasîyê de li Tirkiyeyê raporek amade kir. Di rapore de tê pêşniyarkirin ku divê Kurd kanibin bi zimanê xwe bixwînin û partiyên xwe ava bikin. Hîn çepên Tirk, li hember vê raporê derketin û gotin ev rapor karê imperyalîzmê ye. Berê jî komunîst tevgera Kurdan wek perçekî imperyalîzmê didîtin. Ma qey çêlikên maran bêjahr dibin?

Lê mixabin, hîn Kurd rastiya xwe nabînin û dev ji komunîstên Tirkan bernadin û tewî dixwazin bi wan re cebhê ava bikin.

Gelo çima komunîst siyaseteke nijadperest û nasyonalîst dimeşînin? Ma təkiliya nasyonalîzmê bi komunîzmê re heye? Ma ka komunîst enternasyonalîst bûn û ji bo wekhevîyê, mafê hemû însanan û milletan têkoşîn didan?

Pêwîst e ku analîzeke siyasî bête çêkirin.!

# Dewleta Îranê him bi huqûqî û him jî di wijdanê gel de tawanbar e!

**S**erokdadmendê Dadgeha Eyaleta Bilind a Berlînê Frithjof Kubsch di 10-ê Nisan a 1997-an de biryara dîrokî ya doza "Mykonos" ji raya



giştî re eşkere kir. Dadgeha Berlînê li ser vê bûyara "Mykonos"ê bi teferûat rawestiyabû; piştî 247 celseyan, bi gelek lêkolîn û lêgerînan û bi îfadeyên 176 kesan gihaştibû wê baweriyê ku di kuştina Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê Dr. Sadiq Şerefkendi (Dr. Said) û bepirsiyarê Partiyê yê Ewropayê Fettah Abdulla, bepirsiyarê Partiyê yê Almaniyayê Humeyan Ardelan û tercûmanê wan Nûrî Dehkurdî de tiliya dewleta Îranê heye û ji aliyê vê dewletê ve ev kes hatine kuştin. Ji bo wê jî dadgeh cezayên giran dan wan kesên ku beşdarî ve qatilmê bûne; Kazim Derabî û Abbas Rhajel (ku eslê wî Lubnanî ye) bi cezayên muhebedê, Yusûf Amîn (ew jî ji Lubnanê ye) 11 sal û Muhammed Atris jî 5 sal û 3 meh cezayên hefsê xwarin.

**D**adgeha Bilind a Eyaleta Berlînê di dîdianemeya xwe de weha dibêje; "Serkanîya derketina ve bûyarê û tîkiliyê wê bi şoreşa Îslamî ya Îranê ve girêdayî ye. Piştî şoreşa Îslamî hezên mûxalefê û hezên ku Kurdan temsîl dikirin hemû bûn illegal û di derheqê serok û berbirsîyarên wan ku otonomiyê diparastin de tatbîqat hatin vekirin. Ew mecbûr man ku derkevin derveyî welêt. Lê ji bo ku dewleta Îranê wan ji ortê rake, ew li derveyî welêt jî ji aliyê îstîxbarata Îranê ve hatin taqîbkirin."

Di tespîta delîlan de Dadgeha Bilind a Eyaleta Berlînê şemaya operasyonên ku li derveyî welêt li hember mûxalefeta Îranê hatine kirin, derxist ber çavan. Li gor dadgehê; "Ev oprarasyon li Îranê jî aliyê komîteyêke taybetî hatiye organîzekirin û bi destê balyozxaneyê wê ya Bonnê hatiye tetbîqkirin; ev komîteya taybetî jî Serokdewletê Îranê, ji Serokê Îstîxbarata Îranê VEVAK, ji Wezîrê Karûbarê Derve yê Îranê, ji Wezareta Parastina Îranê û ji Serokê dîni yê Îranê pêk tê."

## Biryara adil

Tîkiliyên aborî yên Almaniyayê bi dewleta Îranê re gelek xurt bûn û dadgeh bi hêsani karibû ve bûyarê bincil bikira. Ji aliyê din Dadgeha Berlînê li ser bûyareke wilo radiwestiya ku xwediyê wê bûyarê li cihanê bê dost û bê kes bûn û dezgehên wê yên xurt û dîplomatîk û lobiyên wê yên bikêrhatî tunebûn. Lê dîsa jî dadgeh hemû riskan da ber çavê xwe û biryara xwe ya adil û bi adelet stend û dewleta Îranê bi huqûqî mahkûm kir. Bi vî hawayî bi huqûqî jî îspat bû ku dewleta Îranê, dewleteke terorîst e, li hember mûxalefeta xwe şid-det û cebîrê bi kar tîne. Rejîma îslamî ya Îranê bi kirinên xwe di wijdanê gelê Kurd û Farisan de tawanbar bû û ev tawanbariya wê êdî bi huqûqî jî hat erêkirin.

Helbet ev biryar jî bo gelê Kurd û tîkoşîna wê ya adil biryareke dîrokî ye. Kurd divê encamên ve biryarê di karûbarên xwe yên diplomasiyê û propagandayê de bi kar binin û jê sûd werbigrin.

Gelê Kurd û rêxistinên wê yên sîvil, demokratîk û siyasî bi biryara dadgeha Almaniyayê kêfxweşiyên xwe anîn zimên û daxwaz ji hukûmeta Avusturyayê kirin ku, ew jî di derheqê qatilmê Dr. Qasimlo de dawa ku vekirine dawî binin. Wek tê zanîn Dr. A. Qasimlo berê Şerefkendi Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bû û di dema hevdîneke bi berbirsîyarên hukûmeta Îranê re dikir di 13'ê Tebaxa 1989-an de ew jî ji aliyê ajanên Îranê ve li Avusturyayê hatibû kuştin û qatilmê wî nehatibûn girtin.

## Kurd bê deng man!

Li gel ku pîrsa Kurdî di peymanên navneteweyî de hîn nebûye pîrseke huqûqî gelê Kurd û rêxistinên wê yên sîvil, demokratîk û siyasî di vî warî de nikarbûn aksiyoneke berbiçav li dar bixin. Lê wexta biryara dadgeha Berlînê ji raya giştî re eşkere bû, ew karibûn li Almaniyayê xwenîşandaneke li dar bixistana; ew hêza ku ji bo berjewendiyên partiya xwe bi 10 hezaran derdixst kolan û stadyûman ya ew ji ber tîkiliyên xwe yên bi dewleta kolonyalîst ku ji aliyê dagêhê ve dihat îthamkirin ve, ya jî ji ber nezani û nekamilbûna şûra neteweyî bê deng man, di şûna wan de mûxalefeta Îranê û di serî de ji alîgirên rêxistina "Mucahîdên Xelk" li Berlînê li ber mahkemeyê bi mitîngeke piştgiriya biryara dadgehê kirin.

## Şerê diplomasiyê

Piştî biryara dadgehê, hukûmeta Almaniyayê daxwaz kir ku Balyozê Balyozxaneyê Îranê yê Bonê Musawî 4 persone-lên din yên sefaretê terka Almaniyayê bikin. Rejîma Îran jî bi awayekî dîplomatîk sefirê Almanya yê Tahrane jî Îranê "qewitand". Li ser daxwaza hukûmeta Almaniyayê hukûmetên dewletên Yekîtîya Ewropayê; "Tîkiliyên xwe yên bi Îranê re, di ber çav re derbas kirin û ji bo

"Ji ber ku pîrsa Kurdî di peymanên navneteweyî de hîn nebûye pîrseke huqûqî gelê Kurd û rêxistinên wê yên sîvil, demokratîk û siyasî di warê ve biryarê de aksiyoneke berbiçav nikarbûn li dar bixin. Lê ev biryar jî bo gelê Kurd û tîkoşîna wê ya adil biryareke dîrokî ye. Kurd divê encamên wê di karûbarên xwe yên diplomasiyê û propagandayê de baş bi kar binin û jê sûd werbigrin."

wê jî balyozên xwe ji bonê şewrê ji Îranê vekişandin."

Li ser biryara dadgeha Berlînê dewleta Îranê bi tevayî xelkê xwe li hember Almaniyayê seferber kir, bi rojan li hember Balyozxaneyê Almaniyayê ya Tahrane meş û xwepeşandin organîze kirin, ve biryara Almaniyayê "mahkûm" kirin. Serokê dîni yê Îranê Alî Hamaney pêşengiya meş û mitîngan kir. Îran jî bo ku dewletên Ewropayîyan bitirsîne tatbîqateke mezin yên leşkeriyê bi armanca êrişî li dar xist. 200.000 leşkerên reşayî, hawayî û bahrê beşdarên tatbîqatê bûn.

Rejîma Îranê dixwaze li dijî 24 şirketên Almaniyayê ku di Şerê Xelîcê de çekên kimyayî firotibûn Iraqê, dawa veke û wan bi huqûqî mahkûm bike.

Di rojên pêşiya me de, dê her tişt derkevin holê; ya dê Almanya li ser şopa Amerikayê here û Îranê wek dewleteke terorîst nîşan bide û tîkiliyên xwe jê qut bike yan jî dê bêje "dadgehên me serbixwe nin" êm dîsa 'dostê' hev in!

## Bûyer çawa qewimî bû!

Ji bo ku beşdarê Kongreya Sosyalîst Enternasyonal bibin Sekreterê Giştî yê PDK-Îranê Dr. Şerefkendi, tevî heyeteke partiye xwe di Îlona 1992'an de hatibûn Berlînê. Piştî beşdarbûna kongreyê, heyeta PDK-Îranê di 17-ê Îlonê de li Berlînê li restoranta "Mykonos" bi mûxalefeta Îranê re hevdîneke kiribûn û di dema hevdîneke de ji aliyê qatilmê Îranê ve hatibûn gulebarankirin û Dr. Sadiq Şerefkendi û bepirsiyarê Partiyê yê Ewropayê Fettah Abdulla, bepirsiyarê Partiyê yê Almaniyayê Humeyan Ardelan û tercûmanê wan Nûrî Dehkurdî hatibûn kuştin. Ji ber ku ev bûyer di restoranta Yûnaniyan a "Mykonos" de qewimî bû, bûyer wek "Doza Mykonos" hat binavkirin.



Dadgîrê Dadgeha Frankfurtê yê Almaniyayê çend meh berê di dozeke de gotibû ku, eroinên ku li ser riyên Tirkiyeyê re derbas dibin, di firotina wan de tiliya seroka Partiya DYP-ê û Wezîra Karûbarê Derve ya Tirkiyeyê Tansû Çiller jî heye (karîkator: Mûsa Kart)

# Stalîn, buxrana Şoreşê û hilweşiyana komara Kurdistanê û ya Azarbeycanê -2-



DR. EMÎR HESENPÛR

## 2) Tiyatroya Diplomasî ya Sovyetê:

Qewwam, di 17-yê sibata 1946-an de careka din bû serokwezîr û roja din bi lez ber bi Moskovayê ve ket rê û bi Stalîn û karbidestên din ên Sovyetê re dest bi muzakereyan kir. Di 4-ê nîsanê de Qewwam û Sadçîkof (sefirê Sovyetê yê Îranê) peymannameyek îmza kirin, ku ev xalên han tê de bûn:

“1. Beşên Leşkerê Sor ji tarîxa 24-ê adara 1946-an pê ve, dê di muddetê meh û nivê de bi temami erdê Îranê terk bikin.

2. Lihevhatina damezirandina şirketa tîkel a petrola Îran û Sovyetê û mercên wê, ji tarîxa 24-ê adarê heta temambûna wê, di muddetê heft mehan de ji bo tesdîqkirinê dê ji bo Meclîsa 15-an bê pêşniyarkirinê.

3. Ji bo ku Azerbaycan amireke hundurî ya Îranê ye, li gor qanûna mewcûd û bi ruhê xêrxwaziya muqabilî xelkê Azerbaycanê, di navbera dewlet û xelkê Azerbaycanê de dê tertîbeke hêminî ji bo îslahatê bê danîn” (35).

Ev lihevhatina han, rîya êrîşa dewletê a ser Azerbaycan û Kurdistanê xweş kir. Eşkere ye ku diviyabû Leşkerê Sor her ji Îranê derkeve. Dewleta sosyalîst ku xwe nûnerê çîna karker dihesibîne, mafê wê nîne welatekî dagîr bike. Lê, li gor wê lihevhatinê û li hemberê “qanûna mewcûd” damezirandina şirketa petrolê pêwîstî bi tesdîqkirina meclîsê bû; ji bo pêkanîna meclîsê diviyabû helbijartinê çêbûya; ji bo helbijartinê jî dibû Azerbaycan û Kurdistan di bin kontrola dewletê de be ji bo ku kontrola dewletê hebe, divê leşker çavdêriya helbijartinê bike û ji bo vê mebestê jî diviyabû leşker vegere Azerbaycan û Kurdistanê.

Beşê dawîyê yê Leşkerê Sor, di 9-ê meha gulanê de, rojekê piştî nivîsandina namêya Stalîn, ji Îranê derket. Dewleta Îranê ku ji bo derketina Leşkerê Sor bi handana Amerîka û Ingîlistanê şikayet li Şûraya Emniyetê ya Neteweyên Yekgirtî kiribû, şikayeta xwe paş de girt, lê Amerîka û Ingîlistanê dest ji ser hilnedan û Şûraya Emniyetê naçar kirin ku şikayetê di nava destûra karê xwe de bigre (36).

Ji bo çibîkirina xala sisîyan a lihevhatinê, gotûbêjên dewletê bi nûnerên Azerbaycanê re, ku nûnerên Komara Kurdis-

tanê jî tê de bûn, dest pê kir û piştî du ciwîn û gotûbêjan, di tarîxa 13.06.1946-an de, ev lihevhatina han a di navbera hukumeta Qewwam û Azerbaycanê de, ji aliyê Muzaffer Firûz û Pişewerî hat îmzakerin. Ev peyman hinek daxwazên Azerbaycan û Kurdistanê di çarçevaya otonomîyê ser û guh jêkirî de qebûl kiribûn, lê rê dida dewleta merkezî ku desthilata xwe di nava herdu komaran de damezirîne. Sefirê Sovyetê yê Tehranê beşdarê gotûbêjan dibû û navberî dikir û nûnerên Azerbaycanê han dida ku bi dewletê re li hev bikin. Piştî îmzakerina peymanê Pişewerî got, eger em bi rîya vê lihevhatina han negihîjin armancên xwe “tu çara me tune em ê çek hilgirin û di rîya şer re em ê bigihînin armancên xwe” (37).

## 3- Xerakirina Du Komaran:

Her wekî di pêş de hat behskirin, wê çaxê, di destpêka meha havînê yê yekem de, tevgera karkeran di Îranê de teqîya. Qewwam, ji bo ku pêşiya pêlên şoreşê bigre, paş de vekîşiya ku heta di fîrseteke din de kês bi destan keve û derbekê lê xe. Berî kincên azadîxwazî û demokrasîyê li xwe kir. Qanûna kar, ku heta dereceyekê li gor qazanca karkeran bû da xuyakirin, ji xwedanmulkan re got ku, divê ji sedî 15 hasilata xwe bidin cotkaran (ev tenê gotin bû û kesekî bersîva wî jî ne da). Dexta ser Partiya TUDEH û rêxistinên pêşkevîxwaz kêm kir û êrîş bir ser hinek kes û rojnameyên enîya darbeyê û hetta di destpêka meha tebaxê de sê endamên Partiya TUDEH kist nav kabîneya xwe û du kesên ji liberan jî bûn wezîrê adlîyê û yê kar. Êdî Partiya TUDEH di nihayeta xwe ya desthilata rêxistinî û siyasî de bû. (38)

Lê Partiya TUDEH, ji delva meşandina siyaseteke şoreşgerî, li ser wê rîyê dimeşîya ku Stalîn di namêya xwe de wek tewsiye ji Pişewerî re nivîsandibû. Partiyê dixwest bi piştigiriya Qewwam de, wê “demokrasîya kêm û kurt” biparêze ku bi çîna Rîza Şah pêkhatibû. Di xeta partiyê de, piştî temambûna Şerê Cihanê, erkê herî girîng ew bû ku careke din agirê şer neyê vexistin. Madem wiha bû, diviyabû xebat ji bo “aştiya cihanê” û “parastina Yekîtiya Sovyetê” wekî bingehê aşti û sosyalîzmê bihata kirin. Di wê xetê de, desthildana li hemberê leşkerê (arteş) Şahînsahî, di Îran û cihanê de aşti xist nava tirsê, çûnkî mumkûn bû ku Ingîlîz û Amerîka jî tîkel bibin û şerek di navbera wan û Yekîtiya Sovyetê de dest pê bike. Di vê nêrinê de, xebat kirin û şoreş wekî çikandina çavkanîya şer dihate dîtin.

Di demekê de ku Partiya TUDEH di muddetê wan deh hefteyên beşdarî di desthilata dewletê de, ji bo tefandina herketê karkeran gelek hewil da (ji bo ku desthilata xwe û ya dewleta merkezî biparêze). Qewwam mijûlî girêdana pilanan li dijî Partiya TUDEH û herdu komaran bû. Di dawîya meha îlonê de, eşîreta Xuzîstanê, fars û navçeyên din ên başûrê Îranê tîkelhevî xistin nava welêt, doza xwedmuxtariyê wekî ya Azerbaycanê kirin. Qewwam tîkelhevîya eşî-

retan kir bahane û guherî. Di nivê meha çiriya pêşîn de wezîrên TUDEH ji kabîneyê hatin derxistin û ew wostaderên (walyên) ku terefdarên TUDEH bûn, rakirin û daxwazên eşîretan hatin qebûl kirin. Çend hefte şûn de dest bi bédengkirina Partiya TUDEH hat kirin û yekîtiya karkeran û rojnameyên azadîxwaz yên çep; di eynî wextê de li çend ustandan idareya eskerî hat damezirandin. Çend ustanderên dijî komunîzmê danîn ser kar û ragihandinan ku helbijartin di meha kanûna pêşî de dest pê bike û di pênc rojan de -heta 7-ê kanûna pêşî 1946 (16yê azêrê)- divê temami be û leşker ji bo çavdêriya helbijartinê dê bê çandinê Azerbaycan û Kurdistanê (39).

Li gor lihevhatina dewletê û ya Azerbaycanê, qerar ew bû ku hukumeta Tebrîzê Zîncanê bide destê dewletê û dewlet jî Serdeşt û Tikab bide destê hukumeta Azerbaycanê. Roja 22-yê çiriya paşîn (yekê sermawezê/azer) dema ku hêzên Firqeyê ji Zîncanê derketin, leşker êrîş anî ser û dest bi kuştina hêzên terefdarên Firqeyê û cotkaran kirin. Qewwam, 1-ê kanûna pêşî (10ê mehê) bi Azerbaycanê da ragihandin ku ji bo çavdêriya helbijartinê dê leşker di ser Zîncanê re bi rê keve. Eynî rojê hêzên fedayî êrîşî leşkerê ku li Xelxal û Herewabad bû kirin û ew şikandin û Pişewerî got ku dê Azerbaycan dest hilde (40).

Pişewerî hem bi gotin û hem ji bi pratîk dixwest hêzên fedayî dest hilde û wekî dema şoreşa meşrûtiyê, Tehran bigrin û azad bikin. Roja 11-yê sermawezê, rojnameya Azerbaycanê xebere Firqeyê nivîsandin ku wiha digotin: “Mirina bi şeref ji jiyana koletî û bi meynet baştir e”. Roja 12-an, rojnameyan ragihandin ku vê carê dê bi carekê li hemberî dagîrkaran bisekinin û gotina xelkê Azerbaycanê ya dawîyê ev e: “Mirin heye, lê vegera bin destê dewletê tune”. Pişewerî di mîtingeke mezin de a li Tebrîzê wiha digot: “Hukumeta Tehranê hukumeteke qatîl û perpût e; em ê vê hukumetê ji ortê rakin û hukûmeteke millî di çiyê wê de deynin.. Dijmin ê li hemberê gelê me bişkê. Bila ji bîra we neçe Settarxan bi çend kesan ve serhilda. Lê em ji bo parastina azadîyê xwedîyê hêzeke qehreman û rêxistinêke fireh in”, wan rojan xelkê Azerbaycanê rojê bi dehan name ji Tebrîzê re dişandin û amadebûna xwe ya ji bo desthildanê didan xuyakirin. Ji bilî hêza bi rêkûpêkî ya Fedayî û qizilbaşan, hêza partîzanî ya Babek hatibû damezirandin (41).

Dewletê, ji bo ku li navçeyên din pêşiya şoreşê bigre, li çend bajarên bakurê Geylan û Mazenderan hukumeta eskerî damezirand û leşker roja 16-an (7ê kanûna pêşî) ber bi Mîyanê bi rê ket. Pişewerî biryarek ji bo hemû azadîxwazan da û got: “Em ê êrîşên kevneperestîyê bişkinin û sofreyê wan rapêçin û bidin hev. Neteweyê Îranê bi quweta destê fedayîyên me yên qehreman dê zîncîrên koletîyê xwe biqetînin... Em ê tol vekin û dê ev tola han xwînavî û bê rehîm be. Dê ev tolek wisan be ku li ser destan bîn nivîsandin û însanên bi şeref pê şad bin”.

Roja 17-an, ew zabîten ku mamosteyê Koleja Eskerî (Danîşkedeyî Efserî) ya Tehranê bûn û niha bi hêzên Fedayîyan re di nav peymanekê de bûn, bi wasitêya Radyoya Tebrîzê bangêk ji bo esker û zabîten nava leşker belav kirin û gotin: “Beşdarê wê memurîyeta bê yom nebin... Vê jî bizanin ku serkeftina hêzên êrîşker ji bo Azerbaycanê ji xew û xeyalekê pê ve ne tiştek e. Hûn baş dizanin ku çek bi çi awayî be bila bibê, ya ku wî bikar tîne, destê beşer e. Li Azerbaycanê ew dest gelek bi hêzên in”. Komîteya Eskerî ya Tebrîzê, hêdî hêdî destûra amadebûna şer dida û çek û benzîna firokan a ji bo firokexaneyê eskerî ji Mîyanê dianîn. Hêzên Azerbaycanê ber bi navçeyê çiyayî ya Qafînkûh bi rê ketin û heta hêzên partîzanî jî bi kar kirin. Roja 19-an şer li Mîyanê dest pê kir. Cebheya başûr, ji xafilbûna fermanderê hêzeke nû, tûşî şikestîne bû û paş de vekîşiya. Lê di cebheya bakur de êrîşkeran zor danê û ber bi Zîncanê ve bi pêş ketin. Grûbek partîzan jî gihişt navbera Zîncan û Tahîstan û pîra trêne ya Qerebûlaxê xera kirin (42).

Izzetê Silêman Begê Derqelîyî ku wê çaxê li Tebrîzê bûye, van bûyeran wiha neqil dike:

“Em grûbek xwendevanên kurd li Tebrîzê bûn û me di Fakûlteya Sîyasî de dixwend. Di wê fakûlteyê de nêzikî 15 xwendevanên kurd hebûn, ku ji Kurdistanê xwarê hatibûn. Em li ser daxwaza Berzanîyê rehmetî qebûl kiribûn.

“Me her gav his bi wê yekê dikir ku çûn û hatina karbidestên Azerbaycanê a Tehranê heye, bi hukumeta Qewwam El-Seltene re rûdinên û gotûbêjan dikim... Di meha çiriya pêşîn a sala 1946-an de gubertinek di bernameya fakûlteya me de hat kirin û di hefteyê de du roj dibû em hîne bikaranîna çekan bin. Em perwerde dikirin û navê re di fakûlteyê de civîn çêdikirin û behsa şer û mercên Azerbaycanê dikirin û herroj hêz ji Qeflankube dişandin hemberê leşkerê Şahînsahîya Îranê. Di destpêka meha kanûna pêşîn a 1946-an de, heyetek ji bo guftûgoyê li Tehranê bû, diyar bû li ser wê yekê li hev kiribûn, ku leşkerê Şah bi navê helbijartinê vegere Azerbaycanê û pişt re kar û barên îdarî bikeve destê azerbaycanîyan.

“Em ew kesên di fakûlteyê de bûn, serî li me gêj bûbû û me nedizanî ka em ê çi bikin. Xwendevanên ku xelkê Tebrîzê bûn, çûbûn malên xwe. Grûbek mamosteyên me hatin ba me, kurekî xort ê bi rêk û pêk bi wan re bû, navê wî Mehêre (Mihemmed) Bîrya û serokê sendîkaya karkeran bû. Gotareke gelek bi hêmaset ji me re kir, dîr dirêj behs kir ku heyeta Tehranê xîyanet kirîye û tirsonekî daye nîşanda. Em dest ji komara xwe bernadin û divê em hemû bibin eskerê parastina komara xwe. Li ser vê, herkesî jê re çepikan lê dan û Mehêre gotina xwe bi vî awayî domand: Niha gelek çiyên din jî hene ku ez ê biçim, sibê li filan çiyê amade bin û em ê heta nefesa xwe ya dawîyê dijîyê bikin. Em nêzikî 30 xwendevan bûn, ku di fakûlteyê de mabûn. Nema ku roja din sibê em çûn sendîkaya karke-

ran, bajar ji serî heta binî vala bûbû û hemû dikan, girtî bûn, li pêşya sendîke-ya karkeran li Kulana Sitarxan, nêzîkî 300 kes wir bûn, kesên çekdar û bê çek, hemû xelkê han didan ku berhev bibin û çek û cebîrxane ji wan re bê..."(43)

Lê ew 300 kes û bi hezaran kesên din ku bi çek dikirin, hatin belavkirin û di cî-ye ku çek ji bo wan bê dayîn, ew kezên çekdar jî hatin jiçekkirin. Roja 20-an ji nişka ve bi carekê yê desthilanîn bû paş-vekêşî û xwe dayîna dest. "Eynî ew roja ku Qewwam destûra êrişê ji bo Azerbaycanê derxist, berpîrsiyarên sîyasî yê Sovyetê bi resmî destûr dan Pişewerî ku nabe hêzên çekdar ên Azerbaycanê li hemberî hêzên dewleta merkezî dest hil- nîn û pêşniyar kirin ku, tenê çend kes jî rêvebirên Firqeyê penayê axa Sovyetê bi- kin. Pişewerî gelek bi tundî li dijî devjê- berdana ji desthilanînê û xwe dayîna destê hêzên dewleta merkezî bû, lê gelek mixabin, ew rîya ku li ser meşiyabû di wan şert û mercan de tu çareyek ji bilî sertewandina li hemberî vê destûrê pê ve nedida..."(44)

Pişewerî ji ber çav wenda bû û Tebrîzê bi radyo û brûskan hêdî hêdî destûra paşvekêşana hêzên fedayî dida. Roja 20- an Bîrya û Cawîd di mîtingê de dan xu- yakirin ku Firqe bi vegera leşker razî ye. Roja 21-an Cawîd û Şabûsterî (ji rêvebi- rên destê rastê yê Firqeyê) brûskê ji Qewwam û Şah re şandin û tê de nivî- sandin ku "îro bi alîkarîya axayê Şabûs- terî me karîbû em axayê Pişewerî û hev- fikrên wî razî bikin ku dev ji dijîmintîya dewletê berdin û ew mebest jî bi xizmeta axayê Seyfî Qazî hat ragihandin." Di ey- nî wê birûskê de, daxwaz ji Qewwam ki- rin ku destûra leşker bide ku dest ji dij- mintî û şer berde. Lê ne Şah û ne jî Qew- wam, yekê ji wan jî bersîva vê brûskê ne- dan û leşker, bi sehkirina çekdanîna he- zen Fedayî, ji nişka ve bûn şer; kuştin, qetlîam û destdirêjîya xwe doman- din(45).

Li Mahabadê, di 5-ê kanûna pêşin de civîneke ji deh kesan pêkhatî, ku Pişewa, Seyfî Qazî û Sedrî Qazî tê de bûn, birya- ra desthilnedanê dan. Roja dawiyê, ku xelkê bajêr ji bo biryardana desthildanê berhev bûn, biryara Pişewa û Sedrî Qazî berxwedana li dijî hêzên dewletê bû, lê aşbetaliya Firqeyê û xerabûna ji nişka ve ya Hukumeta Tebrîzê, roleke mezin li ser guherandina rewşa sîyasî ya Kurdistanê kir(46). Li Kurdistanê biryara desthildanê bû "xwe dayîna dest". "Roja 26ê ser- maweza 1325 (1946)an, leşker bi serû- berîya Şahînsahî, tam piştî salekê kêşîya- na alaya Kurdistanê bajarê Mahabadê girt"(47)

#### 4) Azerbaycan:

Ji Sêwirizîw Heta Stalîngrada Rojava. Bûyera hilweşîna ji nişka ve ya herdu komaran, ku ji amîyê kesekî nedihat hevî kirin, kesekî -ne dost ne dijmin- bawer nekir û ji ber vê di wî warî de tehlîlek ne- dihat kirin. Heta çar meh piştî derketina Leşkerê Sor ji Îranê, qet hevîyek dewleta Îngilîstanê tunebû ku ev herdu hukümet hilweşin. Allen ê sefirê Amerîkayê yê Îra- nê, di birûskê a ji Wezîrê Derve yê Emerîkayê re (28ê îlona 1946an) wiha nivîsandîye:

"Hinek nîşanên firehtir wisan didin xuyakirin ku Ingilîz wekî alternatîfê li hemberî domandina rewşa îro cihêbûna Azerbaycanê ji Îranê dikin, ku ew (ingi- lîz) ditirsin bibe sebebê wê yekê ku beşe- ke zêdetir welat bikeve nav navçeyî (ni-

fûza) Sovyetê. Wisan dixuyê ku fikra wan ew e ku baştir e perçê sêvê a rizî jê- kin ku heta hemû sêv nerize. Dema ku min do bi sefirê ingilîzan re axift, wî got ku hîs bi wê dike ku pêwîstîya serekî ew e, sînorekî yekcarî di navbera komarên Yekîtiya Sovyetê de bîn danîn. Ew hîsa wê yekê dike ku hewlê berdeyamîya hu- kumeta Tebrîzê ji bo Azerbaycanê beşe- ke Îranê bihesibîne, bi waqî'iyetê re li hev nake û netîceya wê rewşêke şimotokî (mushy) ya wisan e ku qet sînorekî ronî di meydanê de nîne. Sovyetî dikarin nîfû- za xwe li ser Tehranê bidomînin û ber bi başûr ve biçin. Wisan dixuyê fikra wî ew e ku Tehran bi qetî dest ji hukumeta Tebrîzê berde û hêzeke eskerî ya bi hêz li seranserê sînore Îran-Azerbaycanê bê bi- cîkirin..."(48)

Di belgeyên nehênî yê wê demê de, wisan dixuyê ku qasek şûn de Amerîka, Qewwam û Şah han dide ku bi piştgirîya Amerîkayê êrişê Azerbaycanê bikin. Dewlet û leşkerê şerperze, pênc meh piştî deketina Leşkerê Sor ji Îranê hê ne xwe- diyê taqeta şer nebû. Allen di brûska 8-ê çîrya pêşî de ji Wezîrê Derve yê Amerî- kayê re nivîsandîye ku di hevûdu dîtina wî ya bi Qewwam a wê rojê de, jê re go- tiye ku:

"Di sîyaseta Amerîka ya parastina yekperçetîya axa Îranê de qet xumam nebûye, lê Îran jî divê wekî Amerîkayê di wê meseleyê de şêlger be. Qewwam ji sefir re got ku li ser wê gelek rikoyî ye ku dê heta deh rojan Zîncanê bigre, eger pê- wîst be dê şer jî bike. Sefîrê Amerîkayê jî kêfxweşîya xwe lê da dîyar kirin. Ji Qewwam re got, girtîna Zîncanê bes e, lê bi kêmasî destpêkek e. Qewwam jê re got, mebest ew e ku gav gav ber bi pêş de biçê"(49).

Li gor gotina sefirê Amerîkayê, ku bi temamî agahdarê êrişê leşker bû, "berna- meya eskerî ya dewleta Îranê berê ew bû ku tenê Mîyanê bîstînin. Eger tiştêkî wi- ha kiribûya, bernamaya îranîyan ew bû ku sebir bikin û bizanin ka dê çî bigewi- me. Hilweşandina gelek ji nişka ve ya tevgera Tebrîzê, bi eşkere ji bo Qew- wam, Şah û hemû kesên din surprîzeke mezin bû..."(50)

**N**ame û brûskên ku sefirê Amerî- kayê yê Tehran, Moskova, Parîs û Cîyên din, ku ji dewleta Emerîkayê re şandine, hewleke gelek zêde hatîye dan ku sebebê hilweşandina du komaran û piştêvanînekirina dewleta Sovyetê tehlîl bikin. Li gor dewleta Fransayê, Moskova bi Qewwam re li hev kirîye ku meclîs peymanî petrola bakur tesdîq bike û Sovyet jî dev ji piştêvanîya Azerbaycanê berde. Allen, di brûska xwe ya 23-yê ka- nûna pêşin de îşareti nêrîna Fransayê ki- rîye û nivîsandîye ku, hem li gor Şah û hem jî li gorî Qewwam, wisan bû ku Sovyet bi awakî gelek xurt alîkarîya Azerbaycanê bike. Sefîr, gotinên xwe di- domîne û wiha dinivîse: "Li gor wan bel- geyên ku li ber dest in, em dikarin bêjin ku karbidestên Sovyetê di destpêkê de meseleyê bi temamî xerab meşandin. Ew alîkarîyên di salên borî de dan rejîma Azerbaycanê, heta dereceyek rezilane bû û çenelêdaneke zêde kirin. Wan, azer- baycanîyan mecbûr kirin ku bi qîmeteke zêde genim, ceh, eşya û pêwîstîyên din bistînin. Di muqabilê vê de mîqtareke berçav tîvingên otomatîk, fişek û eşyayên sivîk dan wan. Qet çekên giran di nav de tunebûn. Serokkonsolosê Sovyetê yê Tebrîzê di cîyê rênîşandana rejîma Azer- baycanê de, bêyî lemaçetîn, kontrola

xwe bi awakî bê şermî nîşan dide û bi wî awayî Pişewerî ji piştêvanîya urf û adetî a berçav ku ji roja yekê a rejîma xwe de hebû, bêpar dikir."(51) Smith, Sefîrê Emerîkayê yê Sovyetê, di brûska xwe ya 27-ê kanûna pêşî ya ku ji wezîrê derve yê Amerîkayê re şandîye, wiha dibêje: "Bila em wisan bihesibînin ku rejîm (a Tebrî- zê) xelkê dîlsar kiribû, hê jî wê jî ecêbtir, Yekîtiya Sovyetê ya Komarên Sosyâlîst di wan ustanan de hêzeke wisan rêknexisti- bû ku eger pêwîst be zêdetir ji azerbayca- nîyên Sovyetê (pêkhatiba), dest li hember- rê pêşveçûn, ceribandîna û tîrsonekîyên Îranîyan berdin."(52) Allen, di brûska 23-yê kanûna pêşî de wiha nivîsandîye: "Sovyet, ji ber berjewendîyên xwe yê hundurî yê Komarên Sosyâlîst yê Ye- kîtiya Sovyetê, ji ber problema firehtir a sîyaseta derve ya (Sovyet) ya li hemberê Ewropayê, ji tîrsa rexne û lomeyên Şûra- ya Emnîyetê û bîr û rayên cihanê, yan jî ji ber hemû van sebeban bi hev re, hêzên çekdar neşandin Azerbaycanê, ji ber wê yekê bû ku rejîma Azerbaycanê gelek zû hilweşîya."(53)

Eger dijminên azadîya Azerbaycan û Kurdistanê bi wî awayî ecêbmayî mabûn, ji ber hilweşîna herdu komaran, terefda- rên rizgarîyê jî, ku ji hêzên gel agahdar bûn, sed car ji wan zêdetir tûşî sergêjîyê bûn. Mamoste Hêmin, ku têkoşerekî Hukumeta Kurdistanê bû, di sala 1973- an de wiha nivîsandîye:

"Hukumeta Azerbaycan ji ya Kurdis- tanê mezintir, bi hêztir, dewlemendtir û tîrçektir bû... Azerbaycan, bi wê dewle- mendî, tîrçekî, leşkerê bi rîkûpêkî, per- werdekîrî û fermanderên zana ve, ji bo çî bi wî awayî zû teslîm bû? Pişewerî, zîrek, şoreşger, mirovekî xwedî tecrube, mîr- xas û serokê Azerbaycanê hemû bû, çî- ma wisan bi lez baz da? Ev ew pîrs in ku heta niha kesekî bi temamî bersîva wan nedaye û ez jî nikarim bidim. Lê ez emîn im ku eger fedayîyan dest hildabûyan û Firqeyê dijîtî kiribûya, ne tenê pê leşkerê belawela û ji halketî yê Tehranê li Tebrî- zê nediket, hemû ew qetlîam jî nedikir û belko dê biêşîya û ne mumkûn bû ku ne di seranserê Îranê û ne jî di Rojhîla Na- vîn de nîfûza emperyalîzmê ev qas qahîm bibe..."

Rast e, Kurdistan piştî girtina Azerbay- canê û dev ji berdana wê peymanî bi hêz, ji hemû milan ve ket bin ablukayê, rast e, beşek ji eşîretan guhê xwe ji silavê re girtibûn û çaverîya xerabîyê ji wan di- hat kirin, rast e, xezîneya Komarê virtî- vala bû û hemû ji bo tutûnê hatibû dan û hê nehatibû firotin û di ambaran de ma- bûn, rast e, ji hemû alîkarîyên derve hevî hatibû birin, lê ez li gor bîr û bawerîya xwe di wê qeneetê de me ku, eger dest- hildan çêbûbûya û tecrube yê me yê şoreşgerî hebûna, dîroka Komara Maha- bade bi wî awayî lê nedihat."(54)

Di brûskeke 17-yê kanûna pêşî de, Al- len dinivîse ku Meclîsa Şadî ku di 16-yê kanûna pêşî de pêkhat, "Şah, axaftîneke bi metih û heta hinek bi şermokî (55) behsa alîkarîya me kir. Hinek kesan go- tin ku Azerbaycan 'Stalîngrada demok- rasîya rojava' û 'hafên pêlane li dijî dest- dirêjîya Sovyetê di seranserê dinê de ye."(56)

Sefîr, ev jî nivîsandîye ku endamên ka- bîneyê û karbidestên dewletê yê wekî wezîrê şer, wezîrî darayî (malîye), serokê bankaya millî, serokê meclîsa dawîyê û yê din, hêdî hêdî serî li sefaretê didin, ji bo ku sipasê Amerîkayê bikin ku Azar- baycan da Îranê."(57)

#### D) DU XET Û DU ÇARENIV-S

Nameya Stalîn çî ronayê dixê ser proble- ma herdu komaran? Ji bo çî Azerbaycan teslîm bû? Ji bo çî Pişewerî baz da? Ji bo çî Kurdistanê dest hilneda? Hem pêncî sal berî niha kifş bû û hem jî îro zelal e ku sebebê hilweşandina du komaran ne bi xurtbûna dijmin bû. Rewîma Şahînsa- hî li gel vê jî, hilweşîna herdu komaran bi xwe ve girêdaye ku buhrana sîyasî ew- qas kûr bû ku nedikarî desthilata xwe xurt bike. Li gel vê jî, Amerîkayê ji sala 1942-an şûn de bernamaya hêzkirina leş- kerê Şahînsahî da domandin, Şah ji tîrsa serhildana xelkê û ji bo parastina ruhê xwe, tac û textê xwe berda û di tebaxa sala 1953-an de bazda çû Bexdayê û li wir jî nesekinî, baz da Îtalyayê. Giringîya vê bûyerê di vê de ye ku, serokatîya rejî- ma paşayetî, di eksê nêrîna Stalîn, bêyî şerkirin bi welatên derve re û tenê bi ser- hildana xelkê di şert û mercên buhranê de lê qewimî û jê derbaz bû(58). Her wi- ha vegera Şah a bi derbeyek Amerîkayê û sîyaseta reformîst a Partîya TUDEH, ew sîyaseta ku gav bi gav di muddetê du- wanzdeh sal xebata gelên Îranê de tûşî şî- kestinê bû.

Lêkolîna bûyer û belgeyan eşkere dikin ku sebebê herî pêşin ê hilweşîna du ko- maran ew bû ku, Yekîtiya Sovyetê fer- mana aşbetaliyê dan rêvebirên Firqeya Demokrat û Partîya Demokrat, wan jî ew ferman cibîcî kir. Di wê aşbetaliyê de, sebebê derve (sîyaseta Sovyetê) û sebebê hundurî (qebûlkirina aşbetaliyê) wisan tîkel bûn ku ji hevûdu nayên cihê kirin, kî bepîrsiyar e? Kîjan sebeb serekî ye? Vêca ji ber vê ka em pêşiyê li sebebê der- ve binêrin. Stalîn, di nameya xwe de lo- me li Pişewerî dike û jê re dibêje ku nabe bi lez here divê hêdî hêdî tîbikoşe û bi "piştêvanîya me'newî" ya dewleta Sov- yetê piştîstîr be. Piştêvanîya me'newî ya dewleta sosyâlîst ku xwe "bingehê şoreşa cihanê" hesêb dikir çî bû? Stalîn eşkere dibêje ku eger Pişewerî û Azerbaycan bi jîrî hereket bikin, bi piştêvanîya Yekîtiya Sovyetê dikarin daxwazên xwe yê herî kêr werbigrin. Lê ev piştêvanîya me'ne- wî ya dewleteke sosyâlîst nîne. Stalîn, behsa teorîya buhranê ya teorîya sîyasî ya Lenîn dike, lê xaleke girîng a wê teorî- yê datîne milekî. Lenîn gotibû ku, li gel wê jî ku buhrana sîyasî li Rûsyayê û li welatên din ên rojavayê zêde bûn, lê şo- reş gelek kêr bûne.

"Ji ber çî wiha bûye? Ji ber wê ku her rewşêke şoreşê nabe şoreş; şoreş di rew- şeke wisan de serhildade ku ew guherî- nê objektîfî yê behsa wan hatin kirin (binêre gotinên Lenîn ên jorê) bi guherî- nê subjektîfî re tîkel bin, yanî îmkanî çîna şoreşger ji bo wî karê cemawerî şo- reşgerî ewqas xurt bike ku bikarin huku- meta kevin bişkinin (yan jî cîyê pîyên wê bileqînin), ew hukumeta ku qet, heta de- ma buhranê de 'nakeve' lazîm e ew bê hilweşandin"(59).

Di wan salan de çend partîyên komu- nîst û karker bi pê xeta sertewandinê ne- ketin, lê dijîtiyeke wisan jî -di warê teorî û îdeolojî de- li dijî xeta reformîst neki- rin. Wek mîsal, Partîya Komunîst a Çînê, piştî temambûna şerê dijî faşîzmê, xeba- ta xwe domand û di sala 1949-an de bi serket. Di meha tebaxa sala 1946-an de, ew dema ku Partîya TUDEH dixwest Sa- lih Cihanî biparêze û sefirê Sovyetê rîya aşbetaliyê xweş kiribû, rojnamevaneke Amerîkî Anna Lois Strang, ji serokê Par-

ZINAR SORAN

## III- PROGRAM Û DESTÛRA PDKT

Damezrandina PDKTyê, di tevgera neteweyî ya Kurdistana Bakur de, xweyî cihê gelek girîng û taybetî ye. Bê ku em çalaki û xebatên "Civata Azadiya Kurd" û "Xoybûn"ê ji bir bikin; bi damezrandina PDKTyê, tevgera neteweyî ya Kurdistana Bakur piştî demeke dûr dirêj, gihayîtiye programeke siyasî û rêxistineke serbixwe. Gava pêşîn a girîng ya bîrûbawerîya pêwîstiya xebatek siyasî û rêxistinî, bi damezrandina PDKTyê ketiye jiyane. Eger em bixawazin damezrandina PDKTyê û programa wê ya siyasî şîrove bikin; divê em zahmetiyên ji destpêkirinê dihatin, şert û mercên wê demê, têgihîştin û qonaxa ku şiyarbûna neteweyî gihayîtibûyê, dûrçav nekin. Ne bi metodekî weha be, em ê nikaribin bi awakî objektîf girîngî, erênî û kêmasiyên bûyereke weha dîrokî rave bikin.

Program û destûra PDKTyê cihê cihê nehatiye amade kirin. Bi pêşgotinê û 7 xalên pêşîn daxwaz û armancên Partiyê yê siyasî hatine diyar kirin; di bin sernivîsa "Honandina (Teşkilata) Partiyê" de jî hûnandin û prensîbên rêxistinê hatine nivîsandin. Tevayîyê wê program û destûrê jî 51 xalên esasî û 2 xalên muwaqet pêk hatiye. Ev destûr û program bi kurdî hatiye nivîsandin. Bi qasî ku tê zanîn, li Kurdistana Bakur ev, destûr û programa yekem e ku bi kurdî hatiye nivîsandin. Ji bona armanc, nerîn û perspektîfên PDKTyê nîşan dide, ez pêşgotin û 7 xalên pêşîn û 2 xalên muwaqet yê wê program û destûrê weke ku hatiye nivîsandin, cuda dinivîsim:

Armanca PDKTyê ne damezrandina dewlete serbixwe bû û ne jî avakirina otonomiya Kurdistana Bakur bû. Weke ku di pêşgotin û madeyên li jor jî hatiye diyar kirin, armanca Partiyê di nav sînorên "Mîsaqa Millî" de, bi riyeke "aşîti, demokratî, mirovanî û komelayetî" bidestxistin û "naskirina mafên siyasî, aborî û kulturî yê neteweyê Kurd" bû. Bêguman ji bo neteweyekî bîndest û welatekî kolonî, ew daxwaz gelekî mutewazî bûn. Lê gava mirov rewşa wê demê ya Tirkîyeyê û Kurdistanê dide ber çavan, bi nasmeya Kurdî, bi daxwazên neteweyî û demokratîk û bi rêxistineke serbixwe ya Kurdî derketina qada xebat û têkoşînê, gaveke gelekî girîng û dîrokî bû.


Li gor îdeyên hinek agahdariyên taybetî, berpirsiyarên PDKTyê difikirin ku di pêşerojê de, gava rewş û merc bêne stewardandin, weke partiyek eşkere û legal derkevin qada siyasî û bixebitin. Loma jî, bi van daxwazên mutewazî ku li gor berpirsiyarên Partiyê jî "mafên herî basît" bûn, derdikevin qada xebatê.

Ji bo pêkanîna armanca xwe, PDKTyê di warê xebat û têkoşînê de, du alternatîf daye pêşîya xwe. Di pêşgotinê de hatiye diyar kirin ku Partî têkoşîneke ku şerê nav neteweyan pêwîst dike naxwaze. Armanca wê milletê Kurd jî weke milletê cihanê azad û serfiraz be. Partî dixwaze ku bi riyeke aşîti, demokratîk û însanî mafên siyasî, aborî û kulturî yê milletê Kurd bê naskirin. Ew hevalbendê nîzama huqûqî ye; lê belê, ji bo bidestxistina mafên neteweyî û mirovî yê gaspîrî jî, tevgera şoreşgerî û serhildanê alternatîf nîşan dide.

## IV-KUŞTINA SEROKÊ PARTIYÊ AV. FAİK BUCAK

Damezrînerên PDKTyê ji destpêkê de

## RÛPELEK JI DÎROKA ME YA HEVDEM



## PARTIYA DEMOQRATA KURDISTANA TIRKIYÊ

## PÊŞGOTIN

Milletê Kurd, milletêkî tarîxî û kevn e. Ew xweyî medeniyet û dewlet bû. Ev rastîya dîrokî nayê veşartin.

Di jîna milletan de dewrên ketî û tarî he ne. Van deman de carna millet hinda dibin, em di rûpelên tarîxa de wan milletan dibînin.

Bîndestîya milletan ne hindabûne, lewra hindabûn: Tarîxa millî, Ezîniya millî, Harsên millî û Zimanê zîmkarî bîrvekirine. Milletê Kurd xwe hinda nekirîye û sitûnê wî yê millî di cidane. Lewra milletê KURD DÎJÎ.

Lê belê ev jîyan ne jîyanekî serfiraz û azayî ye.

Kurd, îro bîndest in. Heqqên mirovanî û millî jê hatine sitandin. Daxwaza me: Milletê Kurd, wek milletên CÎHANÊ azad û serfiraz bi.

Ji bona pêkanîna ARMANCÊ: (PARTIYA DEMOQRATA KURDISTANA TIRKIYÊ) hatiye danîn. Xebata Partiyê, rexeke AŞTÎ, Demokratî, Mirovanî û Komelayetî dimeşe.

Partî, parastîyê "Mîsaqa Millîye". Lewra Partî bawerîye bi yekîti û birayîti û hemberîya Kurd û Tirk'a tîne.

Partî, alîkarê hemî milletên êsir e. Partî yekîti û hemberîya hemî milletan qebûldike. Hevketina Milletan de aşî dixwaze û bawerîya Felsefî, DÎN'î û fikrî de, herkes aza û serbest digre.

Partî, bi "PEYMANA MILLETÊN YEKBÛYÎ" ve, girêdayîye. Û bi her awayî xwînmêjîyê (sûmûrgeyîtiyê) naxwaze û red'dike.

Partî li alê nîzama HUQÛQÎ ye, lê belê di gaspa heqqên insanî û millî de, ber'rabûn û şûreşiyê nîşan dide.

(Mohra Partiyê; "P. D. KURDISTAN T. \*E.S.\*")

Madda: 1- Navê Partiyê: "Partiya Demokrata Kurdistana Tirkîyê".

Madda: 2- Daxwaz û dozên PARTIYÊ: Partî, dixwaze li Cumhûriyeta Tirkîyê da, heqqên Siyasî, İqtisadî û Zanyarî (kültürel) ji milletê Kurd' re bide naskirin.

Madda: 3- Ji bo pêkanîna van şertan: a) Lazîme di ANAYASA Tirkîyê de, bi cî bibe kû: "Dewleta Tirkîyê'yê ji Kurd û Tirk'a çêbûye û ev herdu MILLET di her awayî de wekhevî." b) Di Parlemanê Tirkîyê de, ligora nifûsa xwe Kurd tene temsil kirin û di HEY'ETA WEKÎLA de cî bistînin.

c) Tixûbên Kurdistana Tirkîyê bê kifşkirin û di axa Kurdistanê de tû mihacir neyên bi cî kirin. Navên gunda û bajarên Kurdan neyên guhartin û yên kû hatine guhartin jî, navên xwe yê kevin bistînin.

ç) Di herêmên Kurdistanê de, Walî, Serrekên İdarî, Edlî û giş memûr ji Kurdan çêbin. Tor û adetên Kurdan di qanûna de bi cî bibin.

d) Di Kurdistana Tirkîyê de, zarê resmî bi Kurdî bi.

e) Di Bihîstanên Kurdistanê de, xwendin bi zarê Kurdî bi, lê Tirkî jî bê hînkirin. Universita Kurdistanê bê danîn. Xwendayên xizan ji aliyê dewletê ve bidine xwendin.

f) Li Kurdistanê de Radyo û Telewîzyon bi zimanê Kurdî vebin.

g) Kitab, Kowar û Rojname bi zimanê Kurdî bîn çapkirin.

h) Ji zanyarî (ilim) û îbadeta DÎN'î re mela û İBADETXANEYÊN lazîm bi destê dewletê, bê kêmayî bîn pêkanîn.

Madda: 4- Partî dixwaze: Dewlet, azayî û serkeftin û pêşveçûna Kurdistanê, bi lez û bi ber'ri destpêbike.

## JI BO PÊKANÎNA VA:

a) Ji gundîya re: Xanî, erd, tov û qirêdî pêk bîne. Çandin û firotina titûnê serbest bike.

b) Ji bo karker û cotker û pala re: Şuxul û kar peyda bike.

c) Ji esnaf û bezîrgana re: Qirêdî zêde veke.

d) Bicîkirina koçeran li deşt û zozanan. Temînkirina çêrê û debarê ji terşê wan re.

Madda: 5- Çêkirina rê, sed, baraj, fabrîqe û sinetên giran û nexweşxanan.

Madda: 6- Petrol û meden bîn derxistin û di welatê Kurdistanê de bê tasfiye kirin.

Madda: 7- Petrol û medenên li Kurdistanê dertên, lazîme % 75 kara wan li Kurdistanê bê xerêkirin.

## Madde' ên Mûwaqet:

Madda: 1- Heta Civata Civîna Mezin, hemû wezîfe û selahiyetên Koma Navkom û Civîna Mezin di destê damezrandowan de ye.

Madda: 2- Heta 5 sala yê kû Partî damezrandine, dikarin Civîna Mezin kom nekin.

(Kilişeya "PARTI DEMOQRATI KURDISTAN TIRKIYE")

SEREK  
ZinarSEKRETER  
Pêşmergê WelatMUHASÎP  
Evindarê WelatAZA  
DûrnasAZA  
JirekAZA  
Bende'ê Welat

texmîn dikirin ku di wan şertan de û bi wan îmkanan, hûnandina rêxistineke weha veşartî ne ewqas hêsan e. Ew di zanabûna giranî û zahmetiya wê wezîfeyê de bûn. Loma jî du xalên taybetî û muwaqet li destûra Partiyê zêde kiribûn ku ger mercên kongreyê çênebe, heta pênc salan kongreyê necivînin.

Piştî damezrandina PDKTyê, komek însan bi evîndariyê mezî dest bi xebatê kirin. Bîr û bawerîya pêwîstiya xebata siyasî û rêxistinî di nav gelê Kurd de roj bi roj bêtir belav dibû. PDKTyê di nav gel de, reh û rêçikên xwe berdida. Li gelek

gund û bajarên Kurdistanê komikên Partiyê dihatin ava kirin. Partiyê, bi taybetî di nav gundî, esnaf û memûran de piştgirî û sempatiyê berbiçav digirt. Rewşenbîrên ku di medreseyên olî de xwendibûn ku gelek ji wan di mizgeftên gund û bajarên de meletî dikirin, di pêşketin, belavbûn û hûnandina Partiyê de roleke mezî dilîstin.

Li gor agahdariyên ku berpirsiyarên berê yê PDKTyê didin; karbidestên dewleta Tirkîyeyê jî wê pêşketin û berferehiya Partiyê gelekî nerehet dibûn. Ji bona pêşîya wê pêşketinê bigrin, dest bi

hazîrî û planên taybetî kirin. Hedafa pêşî serokê Partiyê Av. Faik Bucak bû. İstiqbarata dewletê ji nakokî, berberî û dijîtiyê herêmî û eşîrî jî îstifade kir û li hemberî serokê PDKTyê Faik Bucak, komployek amade kir. Di 4ê tebaxa 1966an de, li benzînxaneyek nêzîkî "Karaköprü"yê kemînek li pêşîya serokê PDKTyê Av. Faik Bucak danîn. Di wê erîşî de, Faik Bucak ji lingê xwe birîndar bû û ew rakirin nexweşxaneyê Rihayê. Rewşa Av. Faik Bucak ne ya mirênê bû, lê karbidestên dewletê di nexweşxanê de jî, dev jê bernedan.

Di warê kuştina Av. Faik Bucak de, nerîn û baweriyên cihê hene. Weke ku li jor hate diyar kirin, li gor berpirsiyarên Partiyê, Av. Faik Bucak di encama kompeyêke istiqbara dewleta Tirkîyê hatiye kuştin. Di vê koployê de, istiqbaratê dijminatî, berberî û nakokiyên mehelî û eşîrî bi awakî hostayî bi kar anîye.

Mustefa Remzî Bucak jî di vî warî de weha difikire. Li gor wî jî Av. Faik Bucak bi wasita MITê (Millî İstihbarat Teşkilatı) hatiye kuştin. Li Rihayê, li mintiqeya Qereqopriyê bi destê MITê kemînek tê danîn. Gava ku texsiya Faik Bucak nêzî kemîne dibe, şofêrê wî texsiyê disekinîne, deriyê texsiyê vedike û direve. Di texsiyê de Faik Bucak û du kurên wî hebûn. Texsî tê gulebaran kirin. Faik Bucak birîndar dibe. Bi dû re, Faik Bucak li nexweşxanê wefat dike. Piştî çendakî şofêrê Faik Bucak jî tê kuştin (13).

Kuşîna Av. Faik Bucak, di kovara "Yeni Akış" de jî, weke bûyereke girîng cih digre. Di sernivîsa "Mirineke Xemgîn" de, bi kurtayî li ser jiyana Av. Faik Bucak hatiye rawestandî û di warê awayê kuştina wî de jî weha hatiye nivîsandin:

"Bûyera herî xemgîn ya meha çiyî, bê gûman ji ber dijminatîyê kuştina Av. faik Bucak bû" (14).

Dr. Sait Kırmızıtoprak jî li ser kuştina Av. Faik Bucak weha dinivîse:

"Av. Faik Bucak yê ku ne tenê hevalên wî û gelê Kurd jê hez dikirin, herweha dijmin jî qenciya şexsiyê û qerekerê wî dipejirand, di 4ê tîrmeha 1966an de bi destên kesên tarî, di kemîneke bi bêbextî û pûştî de hate şehîd kirin" (15).

Kuşîna Av. Faik Bucak derbeyeke gelek mezin li Partiyê xist. Ji bo partiyek weha ciwan, wendakirina serokê weke Av. Faik Bucak bêşansiyeke mezin bû. Di ser damezrandina Partiyê de, hîn salek derbas nebûbû. Partî, di qonaxa xwehûnandin û berfirehiyê de bû. Pêwîstiya wê bi beşdariya rewşenbîr û kadirên din yê ku ji derveyî Partiyê mabûn hebû. Di vî warî de, yek ji wan kesên ku herî hevî jê dihat kirin ku dikarîbû wan bikşîne nav Partiyê, Av. Faik Bucak bû. Di wê demê û wan şertan de, dagirtina dewsa serokê weke Faik Bucak ne hêsan bû. Piştî kuştina serokê Partiyê Av. Faik Bucak, Komîteya Navendî ya PDKTyê bi taybetî dicive û biryar digre ku cihê serokê Partiyê Faik Bucak vala bihêlin û Sait Elçi weke sekreterê partiyê lidertiya partiyê bimeşîne. Damezrînerê PDKTyê, li ser vê civênê weha dinivîse:

"Rahmetiyê Faik Bûcak di sala 1966ê, di meha Tîrmehê da hate şehîd kirin. Civînên Koma Navkom (Qomîta Navendî) wek hercaran civînên xwe berdewam kir. Civîna jî bo kuştina Faîqê rahmetî, bi taybetî ji bo ka piştî vê bûyera zor û bextreş wê Partî xebatên xwe çawa bimeşîne û valayîya Serokê bê hempa tije bike. Di nava wan qerar û tedbiran de yek ji ew bû: Me biryar girt ku piştî Serok Faîq em wezîfa serokiyê nedîn kesî û serokê me û hemî Kurda Serokê Netewî û bi nav û nîşan Serok Mela Mistafa Barzanî be. Piştî vê yekê Partî jî aliyê sekreter ve hat meşandin Sekreterê Partî Seîd Elçî yê rehmetî bû. Yanê; ne bi paya serok, bi paya lider û sekreterê xebat hat meşandin..." (16).

## V- HINEK XEBATÊN PARTIYÊ Û ÇEND BÛYERÊN GIRÎNG

Piştî damezrandina PDKTyê, hîmdarên Partiyê dest bi hûnandina rêxistinîyê



Serokê PDKT Faik Bûcak

kirin. Rêxistinîya Partiyê, li gor destûrê bi awakî îlegal û li ser bingehê koman di-hate hûnandin. Her endamê Partiyê naz-avekî wî hebû û li gor destûrê divyabû tenê endamên koma xwe nas bikira. Bi riya berpirsiyarên koman û şifreyên taybetî, peywendiyên koman bi hevdu re di-hate danîn. Partiyê di demeke kin de, li gelek bajar û gundên Kurdistanê komên xwe yê rêxistinî ava kir. Bi vî awayî; hem di warê şiyarbûna neteweyî de, hem jî di warê têgihîştantî û zanebûna rêxistinîyê de, di nav kurdên Kurdistanê Bakur de jî pêşdiketîneke berbiçav çêdibû.

PDKTyê li gel xebata xwe ya îlegal, nedixwest ji xebata eşkere û demokratîk jî bê par bimîne. Li gor rewş û mercên wê demê, heta ji dest dihat, Partiyê dixwest di nav xebatên eşkere û demokratîk de jî cih bigre; rol û wezîfeyên ku di wî warî de bikeve ser milên wê bi cih bîne. Di hilbijartina 1965an de, li cihên ku welatparêzî lê xurt û geş bû, Partiyê teşwîq kiriyê ku welatparêzên kurd xwe weke namzetên serbixê nîşan bidin û piştigiriya wan kiriyê. Li hinek deran jî alîkariya namzetên TIPê (Türkiye İşçi Partisi) yê kurd kiriyê û di derxistinê hinek parlamenterên ji wîlayetên Kurdistanê de, roleke taybetî listiyê. Partiyê bi TIPê û hinek parlamenterên kurd re têkiliyên germ û taybetî daniye. Di nav partiyên siyasî yê wê demê de, tenê TIPê di propogandiyên xwe de, bi hindikî û sergirtî be jî behsa pîrsa kurdî dikir. TIPê, di çarçeweya kedxwarina karker û kedkarên Tirkîyê de feqîrî, perîşanî û kedxwarîna karker, gundî û kedkarên kurdan jî aniyê zimên. Ji ber vê helwestê, PDKTyê jî aliyekî xwestiyê ku nîzikayê bi TIPê re deyne; lê ji aliyê din jî, ji bona TIP di Kurdistanê de zêde cih negre, hemberiyek siyasî jî, ji dest bernedaye. Sekreterê Giştî Said Elçi, di axaftina xwe ya miûnînga Sêwergê de, helwesta xwe ya li hemberî partiyên siyasî yê li Tirkîyê weha aniyê zimên:

"Ez ne endamê tu partiyê me. Ez ne dost û ne jî dijminê tu partiyê me. Hûn kesên ku endamên gelek partiyên ne; pêşniyaz û rica min ji we, di nav tengasî û sofîtiya partiyên de nemînin. Hûn endamên kîjan partiyê dibin bila bibin, gava

menfaetên welatê we ke-te ortê, derdên xwe bi awakî eşkere bibêjin. Eger partiya we li derdên we xwedî derneke-ve, bi ciwammêrî istifakîrinê bizanibin. Kîjan partiya dibe bila bibe, hurmeta me ji wan re heye. Ew organên demokrasiyê ne... Partiyên ku li ser derd û kulên me rane-westin, tenê ji bona reyên me bigrin bèn ber deriyên me, kîjan partiya dibe bila bibe, heta partiya we be jî, bizanibin wan biqewirînin, hîn bibin, ciwammêr bin, li şexsiyeta xwe xwedî der-kevin..." (17).

Di tebaxa 1966an de, Mehmet Ali Aslan li Ankarayê bi navê "Yeni Akış" dest bi weşandina kovarekê dike. Kovar bi tirkî û kurdî dihat weşandin. Di hejmara pêşîn ya vê kovarê de, nivîseke İsmet Tümtürk ji kovara

"Millî Yol" û nivîsek Nihal Atsız ji kovara "Ötüken"ê hatiye girtin û weşandin. Ez dê dûre li ser van herdu nivîsan û bûyerên ku bi xwe re anîne rawestim. Kovara "Yeni Akış" tenê çar hejmar derketiye. Xwedî û berpirsiyariya sê hejmarên kovarê, Mehmet Ali Aslan û yê hejmarê çaran jî, Abbas İzol kiriyê. Av. Mehmet Ali Aslan û Abbas İzol ji ber berpirsiyariya kovarê û nivîsên xwe û Kemal Burkay jî ji ber nivîsa xwe ya di vê kovarê de hatine girtin. Mehmet Ali Aslan di derheqê kovara "Yeni Akış"ê de weha dinivîse:

"Di 1966an de, di nav me û hevalan de munaqeseyek hebû. Bi giştî dihat gotin ku meriv nikare mesela Kurdan bi awakî legal (eşkere) munaqesê bike. Min bi xwe tam eksê wê digot. Divê me ev biceribanda. Min bi navê Yeni Akış kovarek derxist. Ji ber ku min ceza dabû ber çavê xwe êdî ji bo min tu şînor nemabû. Û cara pêşîn li Tirkîyê mesela gelan bi her awayê xwe ve hate raberkirin. Me heta hejmara çaran kovar derxist, di hejmarê pêncan de ez hatim girtin û kovar jî nema derket" (18).

## A-NÛADPERESTIYA KOVARÊN "ÖTÜKEN" Û "MİLLÎ YOL"Ê

Nîjadperestên tirkan jî vê şiyarbûna neteweyî ya kurdan û xebatên dihatin kirin gelekî nerehet dibûn. Wan vê nerehetî û dijîtiya xwe bi her wesîleyê dianîn zimên. Nihal Atsız di kovara "Ötüken" de, li ser vê rewşê weha dinivîse:

"Erdê... Eger dixwazin ji bona ku Kurd bimînin di ber xwe bidin, bi wî zimanê xwe yê îptîdî ku ji çar- pênc hezar gottînan pêkhatiyê bipeyivim, weşanan derxînin, dewletê çêbikin, dikarin koç bikin, herin. Me ev erdan bi xwîna xwe ya weke zembîlê herikiyê, bi qelandina koka ermenîyan, gurciyan û roman girtiye; herweha li hemberî şerkerên şovalyeyên xaçperestan bi xwîna xwe ya weke şurîkê herikiyê parastiyê. Kurdan heta sala 1839an leşkerî dahî nekirine. Gava xwîna tirkan ji Wîyanayê heta Yemenê weke zembîlê diherikî, ew li çîya û gundên ku lê dijiyan, bizînen xwe çêrandine û her ku kês ditîne, bi diziyê û talankirinê jiyanê. Di dema şerê ku me bi Îranê re kiriyê

û ji bona alîkariyê hatine jî, her gav li kês û fîrsê geriyane. Di şerên ku tirk mexlûb bûne de, vê carê jî bi Îranê re bûn yek û li tirkan xistine. Di şerê cihanê yê yekem de, ermeniyên ku bi tevayî îxanet bi me re kirin, eger bi awakî hov gelê Tirk yê ciwar qir nekiribûna û kurdên ku li çîya û gundên asê dijiyan jî vê qirkirinê nefilitîbûna, wê îro li wîlayetên ku piraniyê pêktînin weke kêmatî bijiyana. Lê ger ew sedî sed piraniyê pêk bînin jî, li navçeyêke Tirkîyê xeyala damezrandina dewletê, wê her xeyal bimîne. Weke xeyala yeumaniyan ya Bizansê, xeyala ermenîyan ya damezrandina Ermenîstana Mezin... Ji bona vê yekê, berî serê milletê Tirk di belayê xîne û ew bi xwe jî mahf nebin, bila biteqizin herin. Bi ku de? Dilê wan ku derê dixwaze, çavên wan ku derê dibîne, bila harin wir. Bila herin Îranê, Iraqê, Pakîstanê, Hindîstanê yan jî cem Barzanî. Bila muracatî Neteweyên Yekgirtî bikin û ji xwe re li Afrîkayê ciwarekî bixwazin. Bila ji hevîjadê xwe ermenîyan bipîrsin, hîn bibin û hişê wan bê serê wan ku nijada Tirk gelekî bi sebir e, lê gava dewê wî tîrş bibe û kef bide, weke şerê şahan kesek nikare xwe li ber bigre. Vê gavê ewqas..." (19).

İsmet Tümtürk jî, di nivîsa xwe ya di kovara "Millî Yol"ê de, tedbîr û operasyonên leşkerî yê Hekkeriyê bi serê xwe tîr netîtiye û daxwaz kiriyê ku kirgîzan ji Asya navîn bîne û di nav kurdên Hekkeriyê de, ciwar bikin:

"Hêzên artêşê û cendirmeyan vala lingên xwe li erdê dixin û tiştêk nayê guherandin. Yê ku wan deran baş nasdikin, vê rewşê bêçaretî dihesibînin. Dîbêjin ku mercên av û hewayê, rewşa çîyan, rewşa rîyan û hwd vê rewşê çarenûs dike. Ew erd li ser nexşeyê yê me ye. Lê ne di rastiyê de. Li wan deran ne tenê nîzamên dewletê, herweha tirkayê jî bîyanî ye. Ya rasttir weke ku tuneye. Ew derên req û rût, kaş û çîya tenê perê dewletê dixwin û bê sebeb dixwin. Ji wan ne hezkin, ne alîkarî û ne jî hêz ji dewletê re tê. Lê belê çareserkerîna vê rewşê heye. Çareyek weke şûr bi tesîr û weke hêka Kristof Kolombo zelal heye: Ev jî li wê derê teva çekên wan bicihkirina penaberên kazak û kirgîzan e..." (20).

Xwendekar, rewşenbîr û welatparêzên kurdan, li hemberî van weşanên nîjadperestî bédeng neman. Ji çar aliyên Kurdistanê telgrafên protestoyê hatin şandin. 19 komeleyên xwendekaran yê ku li ser navên bajarên Kurdistanê hatibûn ava kirin, bi belavokeke hevbeş, ew nivîs û bîr û baweriyên nîjadperest protesto kirin.

## TÊBÎNÎ Û ÇAVKANÎ

(13) Armanç, mîjdar 1986, hejmar: 66, r. 7.

(14) Yeni Akış, tebax 1966, hejmar: 1, r. 11.

(15) Dr. Şivan, Kürt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kürdistan İhtilali, Stockholm, r. 10.

(16) Ji agahdariyên taybetî yê ku damezrînerê PDKTyê bi awakî nivîskî ji min re şandiye.

(17) Kasetaya mîtinga Sêwergê ya 2. 08. 1967an. Ji arşiva taybetî ya min.

(18) Yê ku ji kovara İkbine Doğru, İstebol, no: 33 (16-22 Tebaxa 1987), r.33 girtiye: Malmisanîj û Mahmûd Lewndî, Li Kurdistanê Bakur û Tirkîyê Rojnâmegehiya Kurdî (1908-1981), weşanên Jina Nû, Swêd-Adara 1989, r. 169.

(19) Kovara Ötüken, hejmar: 40, r. 6, nisan 1967. Kopîya vê nivîsê di pîrûka Malmisanîj û Mahmûd Lewndî de hatiye weşandin. Binere: b.n.d, r. 174.

(20) Yê ku ji kovara "Millî Yol"ê girtiye, İsmail Beşikçi, Doğu Mitingleri'nin Analizi (1967), weşanên Yurt Kitap, Ankara- Mart 1992, r. 66.

HEJMARA BÊ  
OPERASYONA 1968-AN Û MAHKEMEYA  
ANTALYAYÊ

# Kalik û Bapîr

EMİN NAROZÎ

**D**i danenasîna kîtêba «Rêwîtiya Dûr û Dirêj» de ku di Armança berê ya 173'yan de hatibû kirin, li ser peyva dapîr min gotibû ku ew şaş hatiye bikar anîn, lê li gor agahdariyên min ji wergêrê wê yê beşa Kurmancî Alî Çiftçî û ji Mehmûd Lewendî girtine ew bi zanîn hatiye xebitandin ne ku bi şaşî yan jî li gor devokekî. Çawa ji swêdiaxêvan re jî diyar e di zimanê swêdî de ji bo navê kalik û pîrikê çar formên cuda hene ku di dema wergerandina ji zimanê Swêdî de pêwîstî bi dîtina çar navên Kurdî li hember wan çêdibe. A ji ber vî sedemê jî ew rabûne li ser wan bi hinek kesên din jî şewirîne û tev de li ser formên bapîr û dapîr ê li hev kirine lê bi nişana mê a û nêriyê ê jî ew ji hev qetandine.

Bapîrê min:bavê bavê min=farfar  
Dapîrê min:bavê diya min=morfar  
Bapîra min:diya bavê min=farmor  
Dapîra min:diya diya min=mormor

Çendî ku di gellek zimanên bi nav û deng mîna Înglîzî, Fransî û Erebi de bi tenê du form hene lê bêguman dema mirov ji Swêdî tekstekê werdigerîne, yan jî zimanê xwe dide ber yê Swêdî hingê di van herçar navan de tevliheviyek derdikeve pêşberî mirov. Ji xwe ku mirov li ferhengên Kurdî yên li ber dest dinihêre mirov di wan de jî belawelayiyekê dibîne; wek mînak di Ferhenga Reşo Zilan ya Swêdî-Kurmancî de:

Farfar: bapîr, kal, kalik, bavê bav  
Farmor: dapîr, pîrik, pîr, pîredê, diya bav  
Mormor: dapîr, pîrik, diya dê  
Morfar: bapîr, kalik, kal, bavê bav, tê  
Li gor ferhenga D. İzolî ya Tirkî-Kurdî:  
Anneanne: dapîr  
Babaanne: dapîr  
Dede: bapîr, bavê bavê an dê  
Büyük baba: bapîr  
Nene/nine: dapîr, pîrik

Li gor Ferhenga Y. Z. Paşa ya Tirkî-Kurdî (bi amadekariya M. E. Bozarslan):

Bapîr: dede, babanin babası, yada ananin babası  
Kalik: ata, ananin babası, yada babanin babası  
pîr: yaşlı erkek, yada kadın  
Kal: yaşlı erkek, ihtiyar adam  
Li gor ferhenga Elî Sydo Goranî ya Kurdî-Erebî:  
Bapîr: cedd  
Dapîr: cedde  
Kal: cedd  
pîrik: cedde  
Li gor ferhenga Baran Rizgar a Kurdî-Înglîzî:  
Bapîr: grandfather  
Dapîr: grandmother  
Kalik: grandfather  
Pîrik: grandmother  
Yan jî Înglîzî-Kurdî:  
Grandfather: bapîr, kalik  
Grandmother: pîrik, dapîr  
Li gor ferhenga Salah Rebwar a Swêdî-Soranî:  
Farfar: bapîre, bawikî bawik  
Farmor: dapîre, dayikî baw  
Morfar: dapîre, dayikî bawik  
Mormor: ? tine  
Li gor ferhenga Hejar:  
Bapîr: babe gewre  
Pîrik: nenek, dayikî bavik û ya dayik  
Dapîr: nenek, dayikî dayik û bab, nene  
Kalik: bawe gewre, bapîr

Ger ku mirov van ferhengan giş bide ser hev û devoka hêla xerza û belkî hinekî din jî têxe ser mirov dê bibîne ku ger pêwîstî pê hebe -ez bi xwe wê pêwîstiyê nabînim- mirov dikare wek awayê jêrî formekê jê re bibîne û wusa bikar bîne:

Bapîr: farfar  
Dapîr: farmor  
Kalik: morfar  
Pîrik: mormor

Îcar ger li hinek deverên din awayekî çêtir û jî hevqetandî hebe ez hêvî dikim ku bi ceweta vê nivîsê ew jî derkevin holê û bîne nivîsandin ku belkî bibe alîkar ji rakirina vê tvliheviyê.

# DANASÎNA PIRTÛKAN

amadekar: EMİN NAROZÎ

## Pêlên Bêrikirinê

Ev berhem li ser pêleke dûr û dirêj ji jiyana Kurdên dervayî welêt, bi taybetî jî yên ku bi penaberî li siwêdê dimînin, radiweste. Çendî ku roman bi giraniya xwe û bi salixdan û teswirên xwe yên berfireh li ser jiyana Kurdên Swêdê, li ser jîhevketin û perîşaniya wan a malbatî, li ser gelş û gelemşeyên ku di civakeke nenas î biyanî de derdikevin pêşberî mirov, di-sekine jî lê herweha ew gellek nîgar û salixên pîrrecure ji awayên rêxistinî yên berî 12'yê îlonê, jî şaşî û kêmasî, fedakarî, durustî, pêbawerî û jî bûyerên wê pêla binê Xetê û jiyana li wir dide û bi awayekî zelal wan radixe pêş çavên xwendevanan.

Herweha serûbinobûna jiyana wan kesên ku ji civakeke paşvemaî hatine ketine nav civakeke nû yî modern û bêçarebûna wan jî xweş

## Pêlên Bêrikirinê

Nûdem  
Termov. 52  
176 77 Järfälla/Sweden

Mustafa Aydoğan

Pêlên Bêrikirinê

Nûdem

Nûdem

tê de tê diyar kirin û bi vê re di nav xetan de rexne hem li Kurdên ku bi Kurdî nanivîsin tê kirin û hem jî yên ku nivîsîna bi Kurdî ne bi rêk û pêk lê sükane digirin jî, tî rexne kirin.

Berhem ji aliyê Mustafa Aydoğan ve hatiye nivîsin û di sala 1996'an de li Stockholmê di nav weşanên Nûdemê de hatiye çapkirin.

## Çiriskên Rizgariyê

Ev berhem di warê romanê de di nav Kurdan de hem wek ceribandineke nû ye û hem jî di awayên rêxistinî û xebata şoreşgerî de bi taybetî jî di rewşa şerê çekdarî yê dijî dagîrkirên Kurdistanê de bi xwe re hinek pêşniyarên cuda ku heya niha di nav Kurdan de nehatine ceribandin, tîne. Roman jî serî ve bi zimanekî herek hatiye nivîsin û bi hinek bûyerên sansasonal ku li metropolên Turkiyeyê jî bo dagîrkirê Kurdistanê yê mezin bêgavî ser maseya aştiyê bike tî kirin, hatiye xemilandin.

Bes ji nivê romanê û pêve rewş diguhire û mirov bala xwe didê ku nivîser jî ber tesîra şerê Xelîcê û bûyerên başûrê Kurdistanê rabuye berê xwe daye wir û qada xebatê û giranya wê hê bêtir xistiye hêla başûr û hinek tevger û hevli-

## Çiriskên Rizgariyê

Newroz Bokförlaget  
Hjulsta Backer 22/6  
163 65 Spånga/Sweden

Mehmed Dehsiwar

Çiriskên Bêrikirinê

Newroz Bokförlaget

Newroz Fêrlaget

bat li wir honye û heya ku jê hatiye herdu beşên Kurdistanê pêkve gihîştandî yan jî xwestiyê bigihîjîne yek armanc û yek encamê.

Roman jî aliyê Mehmed Dehsiwar ve hatiye nivîsin û di sala 1995'an de di nav weşanên Newrozê de li Stockholmê hatiye weşandin.

## Kurdîstana bi Fiftî Fiftî

Ev berhem bi tevayî li ser rewşa başûrê Kurdistanê ya piştî şerê xelîcê û avakirina herêma azad radiweste û li ser xebata dezgehên Dewleta Federe ya Kurdistanê (DFK) gellek agahdariyên serwest ku ji hevpeyvînên hinek berpirsiyarên hukûmet û dezgehên herêmê re hatine kirin, dide xwendevanên kurdî. Ji bilî van hevpeyvînan nivîser di serê kitêbê de ji hîlbijartinê heya diyarkirina DFK hema çî bigir di her warî de qonaxa sazkirina dewletê bi çavekî nealîgir diyar dike û beş bi beş bi kurtî rêz dike.

Herweha di pirtûkê de li ser sedemên pêşikîdayina partiyên li hember parlamento û hukûmetê, li ser hoyên şerê xwebixwetiye, li ser sistema nîve-nivî û gelş û gengeşeyên ku bi xwe re aniye û tîne jî bi awayekî rexnegirî tê rawestandin.

Berhem ji aliyê Osman Aytar ve hatiye nivî-

## Kurdîstana bi Fiftî Fiftî

Jîna Nû  
Box 152 16,  
161 15 Bromma/Sweden

Osman Aytar

Kurdîstana bi fiftî fiftî

Jîna Nû

Jîna Nû

sandin û di sala 1995'an de li Swêdê di nav weşanên Jîna Nû de hatiye çap kirin.

Heya vêga jî bilî vê berhema wî du berhemên wî yên din: "Kürdün Makus Talihi ve Güneydoğu Anadolu Projesi" (Bextbireşîya Kurdan û Projeya Başûrê Rojhilatê Anatoliya) û "Hami-diye Alaylarından Köy Koruculuğuna" (Ji Alayiyên Hemîdiyan Ber bi Parêzgeriya Gundan), derketine.

## Di Kurdîstana Navîn de Dewleta Dostikî (ed-Dewle ed-Dostikiyye fi Kurdistan el-Wusta)

Ev berhem beşek ji dîroka Kurdan ya bi rûmet bi serfirazî ku di dîroka wan de kême û cihekî girîng î bêhempa digire, bi awayekî berfireh û bi rêk û pêk rohnî dike û bi xwendevanên Erebi dide zanîn. Kitêb bi haziriyên damezrandina dewleta Dostikiyan ku bingehê wê jî hêla Badê Dostikî ve hatiye danîn dest pê dike û bi serdema Merwanîyan ya ku hê bêtir ew berfireh û serbixwêtir dike, didomîne. Çendî ku piraniya serkaniyên wî jî Ibn el-Ezreq el-Fariqî jî hatine wergirtin lê pê re ew jî gellek dîroknasên serdema Îslamê yên mîna Ibn el-Esir, Ibn Xel-dûn, Ibn el-Cewzî û gellekî din agahdarî digire, wan dide ber hev û cudahiyan wan derdixe holê.

Ev berhema hêja ku ji aliyê Ebdulreqîb Yûsuf

## Di Kurdîstana Navîn de Dewleta Dostikî

Weşanxaneyê Hoşeng  
Kurdaxî Beyrût/Lubnan

Ebdulreqîb Yûsuf


Di Kurdîstana Navîn de Dewleta Dostikî

Weşanxaneyê Hoşeng

Hoşeng

ve hatiye nivîsandin, ji du cildan pêk tê û cara pêşî di sala 1972'yan de li Bexdadê hatiye çap kirin û îsal (1996) jî cildê pêşî careke din li Beyrûtê ji aliyê weşanxaneyê Hoşeng Kurdaxî ve hatiye weşandin. Di dawiya kitêbê de pîr çavkaniyên hêja û di wê de jî gellek wêneyên giranbiha hene, li ser bergê pêşî jî wêneyên du diravên wê demê yên ku ji sala 904'an mane, hene.

# Kewname -III-



AHMED HUSEYNÎ

Erê Kew o!

Tawanbarî bi sersomiya nêrgizan û bi lîlana deştên westayî yên ko di bîrvedana dukuştinan de dilîlînin, hatiye nivîsandin..

Tawanbarî bi sawa goristana nasnameya metirsiyane û bi guliyên gulgenimên agirên ko gîrên min û te digirtin, hatiye nivîsandin..

Tawanbarî bi girêza beranê bê gan û bi xwe jibîrkirina baranê, bi zîrekiya badana simbêlên narincî, hatiye nivîsandin..

Tawanbarî bi sawîra koşeyan û bi bi kalîna xelwetgirana, bi terqîna terîqetên Qadîrî û Neqşibendîyan û bi cizmêketina sofîyan hatiye nivîsandin..

Tawanbarîya gakuviyan û toza ber lingê hespên talana êzîdiyan bû.

Tawanbarîya min û te ji ku çavkaniya hetavê di ser devê me re diçû.

Bêrîkirina giran û qelaçan, û keldûmana tarî ya wî carî ku ji eniya qonaxa me derdiçû

Bêrîkirin e, wek benîştê daran, temenê me yî di tem û mûranê de, dicû..

Erê Kew o!

Rabirdû rastiya bêguman e..

Dahatû xewn e, xapandin e, mij e, mirina hêlînan û riswakirina birînan e.

Tu, qirşîkên deştê û kapeka ardê nûhêrayî, germ, ê bîranînen gundên bêEîra û rêçên bi mastfiroşan nixumandî, aniha, tu, û şîrikê rojan û qezwanên di binê bêrikê de mayî, bi ser kavlên gerdûnekî bêger de dirîjin..De wê bindeqê ji nav tiliyên xwe bavêj! De da ku derya sipî serçavka xwe biçirîne û hogirî rengê keserwedana mişextan bibe wêneyên hişê xwe û xatirxwestina hevalan bi ser kefa pêlan de dawerivîn û gezûya dara giyanê xwe pêşkêşî qûma tavsorka roavahiya peravan bik!

Ma tu jî hînî serdema Madona û Maradona bûyî yan na?

Ma tu jî hînî kirîna gulana û serdana goristanan û bendewariya nameyên hevalan bûyî yan na?

Ma tu bêrya Amûdê dikî?

Ma keç û xortan ku destê sibê berê xwe didan dibistana rojava û dûya cigarê ya ku bi dû wan de bazdida tên bîra te?. Ma dengê Hec Yihya yê ku li ser pirê dizîzikî û mirîşkên li ber gurandinê ku ji ehmeqî dokeniyan tên bîra te? Ma stêrkên havînê yên ku Şêxanî û Xurfanî li ber dengê tembûra Hiznî direqisîn, peyivîna li ser pirtûkên sor û şoreşên şor û serokên kor, heval û xoşewîstên ku me ew berbi goristanê ve bi rê dikirin, dikana Sedeqe ya ku dibû vehesîngeha helbestên Cizîrî Yêrîvana ku dest bi weşanê dikir, Kawîs Axa û Mer-

yem Xan ku şitlên xwe di canê me de diçandin, agirê Newrozê lyê me ew li ser Qelaçê Cîrnîkê dadida.

Cara pêşîn dîtina keçên êzîdiyan, Rimboud û serdema mêrkujan ,mûzika Karmîna Borana û Odêsaya rîn Babas,

Wexta ku em bi ser tofana tipên latîni vedibûn.

Wexta ku Mirê Hawarê bêrîkirina Botan radestî me dikir.

Wexta ku çira gerdûn vedimirî, çemê girî diherikî, nok li tehtê diket, tirênên seferê amade dibûn, hevalên xwîgerm bêdeng dibûn, ma tên bîra te?

De bîn bîra xwe da ku tu ji bir bikî!

Erê Kew o!

Xetîreya te bêber bû, kakilê ronahiya te terr bû, êzîngên te şil bûn, xunava te kerr bû, gula pîrsê gerikî bû, demsalên te kul bûn, asoyên te giran bûn, pûkkirina te bê sûde bû, gêrekirina te bêhûde bû, serberziya te xwebadan bû, dûrbîniya te xwepêşandan bû, pênasîna te jî azardan bû.

Hilma çarereşiyê ji dilê te difûre û berbi tenhatiya me de radikişe.

Qeqeq mêrkuj e lo!

Neqeb xwînrîj e lo!

De xwe hînî razên deryayê û xwekuştina masiyên Salamon ên rê windayî bike!

Hemî peravên nenas wek çiçekên çiçikên axir Bazar bi ser cendekê şeva bêdev de bireşin.

Hespên avê, balendeyên tavê, başok û hemî çûkên ximavê, merbendên evîna xwe, bazbendên rîq û kîna xwe, govendên laşê nazenîna xwe, revend û koçerên rivîna xwe, mûma xwe û bestîna qûma xwe li ber me raxîn, keskesora me bi xêra xwe ji esmanê windayî daxîn!

Deryayê ji xew şiyar bike da ku rûpelên kefê bixwîne, da ku pirtûka axa şewitî bibîne, da ku şûnşopa kevnare ya xwîna me ya arzan bi sipîndarên rehdakutayî biçîne, da ku stiranên şikestî û nameyên ken û girî, û sîbera lerez û westana kerî ji me re biçîne.

Deryayê ji xewê şiyar bike û xweliya dilovan a serê çiyana bi ser pêlan de daweshîn, pelên zer ên hejîra xwe ya tozgirtî û şax û çeçulên xewna xwe ya berbadbûyî û jena xwe ya tobedar jî ji nav pencên seqema neynîkên şoravkê rakişîn, qîrîna dirindane ya bendemanê, pijên tîrsê û qirîktaliya dilbijandina pîrsê, baweshînkê babelîskê û çavşînkê kulîhê gundê xwe, sirûda laşê êvarê û zixtên vegeza li dergehên sînga dildarê, û gavên xwe li kêleka xwîna dermalê ji bir neke, rîhana bi tenê mayî ya pencereya zaroktiyê û dîmenên kesaxê, sawa hişêfê, sikir û mişarên

..

Kêfê û wê bêxwedîmeya têwerdanê li ber serhejandina rengê deryayê û pûnijandina asoyê dunyayê, pîr neke..

Halan e kew o!

Li hevçûna êşan e kew o!

sînga kewnameyê:

1

Agirê me  
ferhenga çiyana bû  
wexta ku agir ji me xeydî  
Ferheng jî,  
li goristaneke bê kêl  
hate veşartin..

2

Wexta ku paytextên me pîr bûn  
Bajarên ji dayîkbûna me  
li ber lingan çûn.

3

Şev pişkiya  
sînorên me li xwe xistin  
Valahiyê dest bi gazinan kir,

4

Rûreşiya xwe  
bi tava heyvê  
dişûşt  
Peyvên xwe  
ji ber çavê tozê vedîşartin  
ku li xwe mikur hat  
rûreşiya wî çurîst.

5

Tu bi kû de diçî  
tu pêrgî miriyan dibî.  
Ma gelo mirî  
li çî xwe digerin bavol?

6

Eger vê carê ez te bibînim  
Bi Xwedê  
ez xwe ji ber te venaşêrim!


7

Nivê axîna min li cem te maye  
ez bawerim êdî bes e  
Eger tu nehinêrî  
ez dê nivê li cem xwe  
dîsa dabeş bikim.

Kew o!



# Grafîkên Serhad



Serhad di sala 1964-an de li Kurdistana Bakur li bajarê Tatwanê hatiye dinyayê. Hin di dibistana navîn de beşdarî têkoşîna netweyî ya gelê Kurd bû. Ji ber xebata wî ya polîtîk, ew mecbûr ma ku di sala 1984-an de terka welatê xwe bike û îlticayê Yûnanistanê bibe.

Ji sala 1987-an heta 1992-an di beşa Resim û Hunerên Pratîk a Akedemiya Hunerên Bedew a Zanîngeha Arîstotelîs a Selanîkê de xwend. Di beşa resim de li atolyeyên Prof. Dimitrî Konto û Prof. Vengelîs Dîmîtreas û di beşa grafik de jî li ba Prof. Yorgo Milîfo ders wergirt. Ji sala 1995-an û vir ve li Navenda Çandî ya Stavropolis a Selanîkê wek mamostayê resman kar kir.

Endamê Yekîtiya Hunerî ya Yûnanistanê, yê Komeleya Hunerê Hunermendên bakurê Yunanîstanê û yê Komeleya Hunerî ya Makedonyayê "TEXNI" Selanîkê ye.

## Pêşnegehên wî

1992: Pêşengeha Mezûnên beşa Resim û Hunerên Pratîk a Akedemiya Hunerên Bedew a Zanîngeha Arîstotelîs a Selanîkê- li şirketa limana Selanîkê.

1994: Komeleya Hunermendên Bakur a Yunanistanê- li porto karras Xalkîdîkî

1995: Salona Huner Isavron 5, Salenîkî

1995: "TEXNI" Şaxê bajarê Kilkîs- Yûnanistan

1997: Hunermendên Polixnî ji bo bajarê xwe pêşkêş dikin- Yûnanistan.

1997: Navenda Çandî ya Stavropolis- Selanîk



Gundî, 1989, grafika li ser dar



Hawar, 1989

## "Êş mirov dide fikrandin, xwedî fikirbûn mirov dike zana û bi zanebûnê mirov tehamulê jiyanê dike"

KOSTAS LAXAS\*

Ev xortê bi edeb, bi salan, min ew di ciyên pêşengehan de, di salonên hunerî û festîvalan ciwanan yê partîyan û xwepeşandanên polîtîk de didît. Her weha ew di her meha Nîsanê de çalakîyên bi salvegera qirçîrîna Ermenîyan û di Gulanê de jî ji bo bîranîna Pondîyan de ciyê xwe digirt. Gelek caran di van aktivîteyan de çavê me bi hev diket. Ev xortê han, her gav ji bo min wekî mirovekî nas û xwedî berbîrsîyar bû. Ew di gel xwendin û pêşdebîrîna xwe ya zanyarî û hunerî, wek bajarvanekî, bi buyarên girîng yê piştî tevgera Jon Tirkan û Şerê Balkanê ku di navbera 1912-13-an de qewimî bûn, alaqa dar dibû.

Min ew nas kir, beyî ku min ew dizanibû. Her weha bê lez û bez, ji dûr ve û bi dilgirani, bi ev xortê bijarte re, meylekî nêzikbûnê ya bi dostaniyê di nav me de peyda bû. Heta ew roja ku me rûbi rû dîtînen xwe ji hev re eşkere kir, gelek hîssên me yê di derheqên hev de êdî ji wext re mabûn. Lê êdî em bahsa daxwaz û evîna xwe ya hevbeş, di derheqê huner û ciyên meslekî, tiştên ku di zanîngehê de tê xwendin û kar û xebatên min; galerîya "KOXLIAS" ku di destpêkê de, li wê derê, li zemîna kuça Mîtropolîtu Iosif 24, li quncikê Tsîmîskî û li paş jî, Navenda Çandî ya Vellîdio, dema ev xortê penaber û bê cî û war êdî bubû xwendekar ê beşa Wêne û Hunerên Pratîk a Akedemiya Hunerên Bedew a Zanîngeha Selanîkê.

Ez bahsa hevalê xwe yê hezkirî resamê Kurd Serhad dikim. Ew ê bi zanetî xwest bibe hemwelatîyê Yûnanîstanê, ew ê jî aliyê dewleta Tirkan ve hat qewitandin. Ew ê ku di binê bist saliya temenê xwe de, di sala 1984-an de derbasî Yûnanîstanê bû "wek penaberekî

polîtîk xwe spart bajarekî mewanperwer; Selanîkê ku ev bajêr her gav bûbû warê penaberan.

Ez pêwîst dibînim ku di derheqê kok û nijada û rewş û jiyana Serhad de agahdariyê bidim ji ber ku ez bawer im, ev yeka ha tesîreke xurt li ser huner û berhemên wî kirine. Ji alîkî ve bêtir ku bikeve nav şaxên folklorîk yê sivik, tîkiliyên xwe bi serkaniya hêjayên xwe yê destpêkê re xurt dike.


Divê ez li vir diyar bikim ku, tîkiliyên me yê pîralî, yê mirovî, polîtîk û hunerî tesîr li min kir ku ez li hember Serhad bibim xwediyê niyetên pozîtîv. Ev hizra min her berdewam e. Her wekî ku tê zanîn, ez dîrokanê hunerê û ne jî rexnegîr im. Her çî tiştên ku ez li ser wenyên wî tînim zimên, encama ev tîkiliyên me yê dosyaniyê ne. Wek gotînen ji dil, ji aliyê hunermendekî wekî wî, ku ew bi xwe jî di nav deryaya pîrsegîrê hunerê yê hevdem de dimeşe.

Mijara sereke yê hunerê Serhad ku nuha wêne û grafîkên xwe li Navenda Çandî ya Beledîya Stavropolis a Selanîkê pêşkêş dike hê jî li ber çavên mirovan in. Rast e ji nû ve avakirin ji nû ve şirovekirin li gor estetîk û daxwazên hunermend in. Divê bê gotin ku, gava ku Serhad grafîkên rûyê mirovan çêdike, bêtir ku bilezîne, war û nijada wan mirovan jî derdixîne holê. Her weha dema ku rîsmê dimeneke çêdike, adet û ananeyên mirovên li cî û warê xwe dertê holê. Wexta kêman caran wenyên wî bê figûrên mirovan bin jî, ez di wê baweriyê de me ku mirov, di tawilê de hizra Serhad a berhemî û polîtîkî fêhm dike. Ji bo wê jî hunerên Serhad bi rastiya jiyanê û bi tîkoşîna dîrokî ya gelê Kurd ve girêdayî ye.

Serhad, wekî wêneker û grafîker xwediyê armanç û îdealekî ye. Di berhemên wî de bi tevayî kolona jiyanê



Jina li nav gund



Helepçe, 1989



û mirovên ku bi nîjada xwe serbilind in hene. Grafîkên wî kerektera jiyana hemwelatîyên xwe bi zelalî ifade dikin.

Na, Serhad ne mirovekî muhafezekar e. Li cem wî agahiyên di derheqên bazara hunerî ya navneteweyî kêm nînin. Lê dîsa jî ji bo nuha ew dê hêza xwe ya hunerî biparêze; ew di wê fikrê de ye ku bi hunerên xwe mil dide têkoşîna hemwelatîyên xwe ji bo welatekî serbixwe. Ji mêj ve be jî ew bi hunerên xwe vê têkoşînê teşwîk dike.

Serhad endamê civata Kurd e û pê serbilind e. Bey ku ew ciyê ku hatiye dinyayê ji bîr bike. Li Bakurê Kurdistanê li bajarê Tatwanê ev xortê hêja yek ji donzdeh zaroken malbatekê ye. Di sala 1964'an de ew ronayîya jiyana xwe dît. Li gel ku mecbûr ma warê xwe bigehurîne û bibe penaber, dîsa ew li penaberiye li Selanîkê xewnên welatê xwe dibîne, tekoşîna hemwelatîyên wî yê Yûnanistanê dilê wî germ dike.

Çavkaniya jiyana wî ciyê ku jê te ye : Kurdistan e.

Çavkanya huner û afirandina me herduyan: Yûnanistan e.

Ez hesûdiya te dikim Serhad; ji ber ku tu xewn û daxwazên xwe bi laşên gelê Kurd û Yûnanê ve girê didî.

Ji ber vê yekê sernivîsa vê rexna xwe pêşkêşî te dikim, ku ji dilopên pak yê jiyana gelên Rojhilata Navîn tî. "Êş mirov dide fikrandin, xwedî fikirbûn mirov dike zana û bi zanebûnê mirov dikare tehamulê jiyane bike".

Tu van tiştan hemû dizanî, li ser van bûyî şarîza, ji ber ku tu wan di canê xwe de his dikî.

*\*Nivîskar û Wênekare Yûnan e*



Dê û zarok, 1989 grafîka bi asit

# Rastnivîsandina jimarnavan

zerevan@algonet.se • ARIF ZÉREVAN

**Di rastnivîsandina jimarnavan de têkilîkiyeka berbiçav heye ko divêt bêt mînaqêşe kirin. Piraniya nivîskarên kurd îro jimarnavan xelat ditewînin û dinivîsin. Di vê nivîsarê de ez dê bi argûmentên dîrokî û gramatik nerastiya awayê şaş destnîşan bikim û binasên şaşîyan jî rayxim ber çavan.**

## Jimarnavên bingehî

Di kirmanciyê de jimarnavên bingehî ev in:

yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, nozdeh, bist, sih, çil, pêncî, şeşt, heftî, heştî, not, sed, hezar, milyon, qitilyon ...

## Tewanga jimarnavên bingehî

Di kirmanciyê de zayenda hemî jimarnavên bingehî me ye û ew bi "ê"-yê tene tewandin. Botî, behdîni, hekarî şikakî û klasîkên bi kirmancî jimarnavan me dihesibînin û bi qenaeta min ev jî wan tewangên di rasttir e.

yekê, didoyê, sêyê, çarê, pêncê, şeşê, heftê, heştê, nehê, dehê, yazdehê, diwazdehê, ... bistê, sihê, çilê, pênciyê, şeştê, heftiyê, heştiyê, notê, sedê, hezarê, milyonê, trilyonê, qitilyonê ...

Yanî mirov dibêjît:

Ez yekê dibînim  
Ez çarê dibînim  
Ez heftiyê dibînim

Ji van nimûneyên jorî diyar dibit ya ko mirov dibînit hejmar bi xwe ye, ne navdêreka ko dayî pey wê ye. Lê di nimûneyên jêrî de yê ko mirov dibînin ne hejmar bi xwe, lê navdêr in:

Ez yek zelamî dibînim  
Ez çar zelaman dibînim  
Ez pêncî zelaman dibînim

Ez dê niho nimûneyekê binivîsinim û rave bikim:

Ez 27 zelaman dibînim

Heger ko em navdêra ko "zelam" e rakin, hingê em dikarin holê binivîsin:

Ez 27-an dibînim

Yanî ev "an"-a he tewanga navdêrek gelejimar e ko daye pey jimarnavê.

Li ferqa di nêvbera van du nimûneyan de heye binêre:

Ez sala 1997-ê bûm 32-salî (Ez wê salê bûm 32-salî)  
Ez 1997 salan nikarim bijim (Ez wan nikarim bijim)

Di nimûneya ewilî de "1997" jimarnaveka yekejimar e ko bi "ê"-yê têt tewandin û mirov dikarî pronava "wê" biêxe cihê wê û lêkerek dikarî bidit pey wê. Lê belê di nimûneya didoyê de "1997" jimarnavek e ko navdêreka gelejimar "sala" daye pey wê, pronava tewandî "wan" nikarî bikevit cihê jimarnavê û lêkerek jî nikarî bidit pey wê.

Yanî mirov nikarî bibêjît:

Ez sala 1997-an bûm 32-salî (Ez sala wan bûm 32-salî)

Ji ber ko "1997" yek sal e û tenê pronava tewandî "wê" dikarî bikevit cihê wê.

## ŞANEK

Di heqê tewanga jimarnavên bingehî de nêrînek heye ko dibêjît jimarnavan zayendên cîda hene û jî lewra jî divêt ew li gor wan zayendan bêne tewandin. Li gor nêrîna Celadet Alî Bedir-Xanî zayenda jimarnava "1"-ê me ye, lê ya jimarnavên ji 2-ê ta 20-ê gelejimar e û ya jimarnavên girover 30, 40, 50, 60, 70, 80, 90 û 100-ê nêr e û lewra divêt bi "î"-yê bêne tewandin. Li gor teoriya wî ev nimûneyên he rast in:

Ez yekê dibînim  
Ez çaran dibînim  
Ez bistî dibînim

Celadet dibêjît jî ber ko zayenda "çarê" gelejimar e ew navdêra xwe jî li gor xwe ditewînit. Lê rastî ne welê ye. Ji ber ko ne jimarnavê tewanga xwe daye navdêrê, tewanga gelejimara navdêrê bi jimarnavê ve bûye. Gava em "Ez çaran dibînim" dibêjin navdêreka veşartî heye ko em bi nav nakin. Divêt em bibêjin "Ez çar zelaman dibînim" yan "Ez çar tiştan dibînim". Heger ko bi rastî jî tewanga jimarnavê tehsîr li navdêrê bikira divêt me "Ez yek zelamê dibînim" binivîsanda jî ber ko zayenda "yekê" me ye.

Yanî jimarnav me ne û hemî jimarnav yekejimar in, lê belê navdêrên dikevin pêşiya wan an didin pey wan dikarin gelejimar yan yekejimar bin.

## Jimarnavên rêzê

Di kirmanciyê de jimarnavên rêzê bi arîkariya pronavên îşarkî yê qersene "yê", "ya" û "yên" tene çêkirin.

yê yekê, yê didoyê, yê sêyê, yê çarê, yê pêncê, yê şeşê, yê heftê, yê heştê, yê nehê, yê dehê, yê yazdehê, yê diwazdehê, ... yê bistê, yê sihê, yê çilê, yê pênciyê, yê şeştiyê, yê heftiyê, yê heştiyê, yê notê, yê sedê, yê hezarê, yê milyonê, yê trilyonê, yê qitilyonê ...

De hevokan de piraniya çaran pronavên îşarkî yê qersene "yê", "ya" û "yên" dibin veqetandek û bi navdêran ve dibin. Ji bikaranîna wan ya di hevokê de mirov dizanî ka ew çawa jimarnavên bingehî dikin jimarnavên.

ven rêzê û ka ew tewangên jimarnavên bingehî ne an no.

Gava ko em "Ez sala 1986-ê çûm Wanê" dibêjin hingê em jimarnavê li gor zayenda wê ya me ditewînin. Lê gava ko em "Cara pêncê, zelamê heftê, mirovê dehê, dengbêjê sedê û hw.d." dibêjin em wan diêxin rêzekê de.

Ez dê jî hinek klasîkên kirmancan hinek nimûneyan bidim ko teoriya Celadetî piştrast nakin. Ehmedê Xanî di "Nûbihara biçûkan" de holê dinivîsin:

Ji kelîma sanî bigir tu herfa çarê  
Tarîx e jî bo "Nûbiharê"

Herwiha gava ko Ehmedê Xanî rîknên îslamê dihejmêrit ew holê dinivîsin:

Rîknê di îslamê pênc in:

Rîknê ewil  
Rîknê didoyê  
Rîknê siyê  
Rîknê çarê  
Rîknê pêncê

Mele Mehmûdê Bayezîdî sala 1858 û 1859-ê cildê yekê yê "Şerefnameya" Şerefxanê bidlîsî jî farisîyê wergerandiye bo kirmanciyê. Di rûperê didoyê yê destnivîsa Mele Mehmûdî de dabeşkirineka holê heye:

Qismê ewil  
Qismê duyê  
Qismê siyê  
Qismê çarê

## ŞANEK

Di vê sedsala paşiyê de hinek kirmancan dest pê kirine ko jimarnavên rêzê bi "em" û "emîn" dinivîsin. Ev bi tehsîra soraniyê hatiye nêv kirmancan. Ji aliyê gramêrê ve ti bivênevêti nînit ko mirov wekî soran bikî, jî ber ko di hevokê de diyar dibit ka "ê"-ya bi jimarnavê ve bûyî tewang e an no:

Jimarnavên rêzê:

Cara sedê  
Hilbijêrê didoyê  
Pêxemberê şeşê  
Serokwezîrê nehê

Jimarnavê bingehî:

Kerem sala 1955-ê jî diya xwe bû  
Xezal jî hejmara 60-yê hes nakit  
Min jî roja 20-ê hêviya xwe birî

## "Divê meriv objektîf be!"

Di hejmara 173-174 (13-14) an ya rojnameya we de nivîswekê Evîndarê Farqînî bi navê "Nivîsakarî urustiyê divê" hat wşandin. Di vê nivîsê de E. Farqînî rexneyên xwe li ser şend nivîs û wergerên A. Gernas yê ku di van demên dawiyê de hatibûn wşandin, diyar dike. Her weha di wê nivîsê de, ez tim bi navkirin ku xwedîgiravî heqê min hatibe xwarin. Lê rastî ne weha ye, jî ber ku:

1. Ez ne wergêran im. Tevî ku zimanê Erebi û Polonî dizanim, lê nayê wê mahneyê ku ez jî wan zimanan karibim nivîs wergerînim bo zimanê Kurdî. Min bi Erebi û Polonî xwendiyê lê mixabin bi Kurdî nexwendiyê.

2. Ew wergerin li ser muzîkê û folkorê ku hatine wşandin, ez û A. Gernas bi rojan rûniştine gotin bi gotin, hevok bi hevok li ser xeberîne.

3- Em bi Kurdî dibêjin, "Xwar rûnê lê rastiyê bibêje" û rastî jî weha ye.

Eger ev wergêr li benda tembeliya min bimana tu-car nedigigan destê xwendevanan. Keda ku A. Gernas jî bo ewergêr û wşandina wan rijandiye, eger jî keda min ne zêdetir be ne kêmtir e. Û jî ber wê yekê jî ez bawer im ku mantiqê însafê dibêje ku mafê A. Gernas heye ku navê wî jî li tenîştê yê min di bin wan wergêran de heb.

Ji bo ku rexnegirtin objektîf be û rolên xwe yê pozîtîv bi cî bine, divê ku bingeha wê fakt bin. Û wer diyar e ku hevalê me E. Farqînî lêkolîn i ser van faktan nekiriye û jî ber wê jî, min xwest vê nameyê jî we re birêbikim da ku hîn rastî ronî binin jî ber ku ... "nivîsakarî durustî divê".

Di xweşiyê de bimînin.

XWEŞNAV

## RADYOYA MIZGÎNIYÊ Lî Ewropayê

Hera Şemiyê êvarê di navbera seat 20.45 û 21.00-ê de li ser pêla navîn(MW), 1395 kHz.

## Lî Tirkiyeyê

Her roja Şemiyê û Yekşemê çvarê di navbera seat 21.45 û 22.00-ê de li ser pêla navîn(MW), 864 kHz.

## Radyoya Mizgîniyê

P. K. 1125, 354 41 Biebertal, Almanya

# Derheqê Kirmanckî (Kirdkî) de Kombiyayîşê II. ê Stockholmî

28-31ê adare  
1997

**R**oja 28ê aşma (menga) adare de, Stockholm de, kirmanckî (kirdkî, dimilkî, zazakî) ser o kombiyayîşê diyine dest pêkerd û çar rojî (28-31ê adare) ramit. Nê kombiyayîşê diyine de nê heştês kesî amade bî:

Osman Aytar (Sêwregi)  
Yildiray Beyazgül (Gimgim)  
Çeko (Gimgim)  
Mûnzûr Çem (Dêrsim)  
Hûmanê Çıyan (Depe)  
Haydar Diljen (Sêwregi)  
Nihat Elî (Sêwregi)  
J. Espar (Pîran)  
Cemîl Gündogan (Dêrsim)  
Lerzan Jandîl (Gimgim)  
Huseyin Kulu (Dêrsim)  
Seyîdxan Kurij (Çewlîg)  
M. Malmîsanij (Pîran)  
Selim Mûrat (Pali)  
Robîn Rewşen (Licê)  
Kamer Söylemez (Dêrsim)  
Harun Turgut (Pali)  
Şukrî Urgan (Hêni)

Nê kombiyayîşê de amadebiyayoxî nê meselanê cêrînan ser o vindertî, munaqêşe kerd û meylê xo tesbît kerdî:

## I-Name

- 1) Nameyê lehçeya ma
- 2) Nameyê hetan (cîhetan)
- 3) Nameyê mangan (aşman)
- 4) Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî

## II-Zemîr

Zemîrê kesî (zemîrê şexsî)

III-Sîfê

Rengî

## IV-Hûmarî

Şima nê nuştî de netîceyanê nê munaqêşeyan û meylan wanênê. Netîceyê ke ze meyl tesbît bîyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan îfade kenê. Nê, ze tewsîyê û teklîfî yê.

Tanî çeku (kelîme) yan zî formê çekuyan ê ke ma no nuşte de ze nimûne nuştê, tanî mînaqayan de ciya yê.

## I-NAME

### 1) Nameyê lehçeya ma

Kurdê ke bi lehçeya ma qisey kenê ca ra ca xo ra vanê kirmanckî, kirdkî, zaza yan zî dimilî / dimlî; lehçeya xo ra vanê kirmanckî, kirdkî, zazakî yan zî dimilkî / dimilî / dimlî.

Meylê kombiyayîşê nê çekuyan (kelîmeyan) ra kirmanckî û kirmanckî ser o yo.

### 2) Nameyê hetan (cîhetan)

kirmanckî (kirdkî)	tirkî
rojawan	batî
rojhelat	doğu
vakur	kuzey
başûr	güney
vakurê rojhelatî	kuzeydoğu
vakurê rojawanî	kuzeybatî
başûrê rojhelatî	güneydoğu
başûrê rojawanî	güneybatî

### 3) Nameyê mangan (aşman)

Kirmanckî (kirdkî) de him çekuya mengi him zî aşme / aşmî / aşm vajiyêna. Tanî cayan de mengi yena mena mois a zıwanê frenskî (30 roj), aşme yena mena lune a frenskî (bi tirkî gökteki ay). Tanî cayan de zî çekuya mengi nêvajiyêna, aşme him mena mois him zî lune a zıwanê frenskî dana.

#### kirmanckî (kirdkî) tirkî

1. çele	1. ocak
2. sibate, gucige	2. şubat
3. adare	3. mart
4. nîsane	4. nisan
5. gulane	5. mayıs
6. hezirane	6. haziran
7. temmuze	7. temmuz
8. tebaxe	8. ağustos
9. êlule	9. eylül
10. oktobre	10. ekim
11. teşrîne	11. kasım
12. kanûne	12. aralık

Nê nameyan ra çele nerî (masculin) yo, nameyê bîni makî (féminin) yê.

Nameyê mangan bi herfa hurdî (wurdî) dest pêkenê.

### 4) Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî

Goreyê îdareyê dewletan tanî nameyê cayan nê yê:

kirmanckî (kirdkî)	tirkî
dewe	köy
nahiye	nahiye
qeza	ilçe, kaza
şaristan, bajar	il, vilayet; şehir, kent

Meylê kombiyayîşê nê panc çekuyanê corînan ser o yo, labelê formê bîni zî estê. Nimûne:

meylê kombiyayîşê	formê bîni
dewe	dewî, dew
şaristan	şahrestan, şehir, şehîr

sûke: Tanî cayan de çekuya sûke / suki / sük menayanê şehir, kent, il merkezi, ilçe merkezi yan zî çarşî yê tirkî de vajiyêna. Ma vajî Diyarbekir, Erzingan û Sêwregi ra sûke yan zî suki vajiyêno. Ziwanê erebkî de sûq mena çarşu y de ya û tanî nuştuxî vanê ke eslê na çekuya zıwanê berberkî ra ameyo.

### Şaristan û qezayê Kurdistanî

Ma nê kombiyayîşê de nameyanê tanî şaristanan û qezayan ser o vindertî. Tiya de ma derheqê nê nameyan de meylê kombiyayîşê nusene. Ma wext nêdî ke nameyanê şaristanan û qezayanê bînan ê Kurdistanî ser o vinderê.

**nameyo kirmanckî nameyo ke dewlete panawo**

### 1) Bidlîs

1. Elcewaz
2. Hîzan
3. Motkî
4. Tûx
5. Xelat

### 2) Çewlîg

1. Azarpêrt
2. Bongilan
3. Çêrme
4. Dara Hêni
5. Gêxî
6. Kanîreş
7. Xorxol

### 3) Dêrsim, Mamekiye

1. Çemişgezek
2. Mazgêrd
3. Pêrtage
4. Pilemuriye
5. Pulur
6. Qisle
7. Xozat

Dêrsim eslê xo de nameyê yew mintîqa yo. Nameyê şaristanî bi xo Mamekiye ya, ci ra Kalan zî vajiyêno.

### 4) Diyarbekir

1. Bismil
2. Çermûg
3. Çınar
4. Erxenî
5. Gêl
6. Hezro
7. Hêni
8. Karaz
9. Licê
10. Pasûr
11. Pîran
12. Silvîyan
13. Şankuş

### 5) Erzingan

1. Ciminî
2. Îlîç
3. Kemalîye
4. Kemax
5. Mose
6. Refahiye
7. Têrcan

### 6) Erzirom

1. Aşqele
2. Çat
3. Gogsî
4. Hesênqele
5. Îspîr
6. Narman
7. Oltî
8. Olur
9. Ortîlî
10. Tatos
11. Xinûs, Kela
12. Xoresan

### 7) Mûş

1. Gimgim
2. Kop
3. Milazgir

### 1) Bitlis

1. Adilcewaz
2. Hîzan
3. Mutki
4. Tatvan
5. Ahlat

### 2) Bingöl

1. Adaklı
2. Solhan
3. Yedisu
4. Genç
5. Kîgî
6. Karlıova
7. Yayladere

### 3) Tunceli

1. Çemişgezek
2. Mazgirt
3. Pertek
4. Pülümür
5. Ovacık
6. Nazîmiye
7. Hozat

### 8) Riha

1. Bêrecûg
2. Curnê Reş
3. Hewenc
4. Serê Kaniyê
5. Sêwregi
6. Sirûc
7. Wêranşar
8. Xelfetî

### 9) Semsûr

1. Aldûş
2. Bêsnî
3. Çêlikan
4. Kolik
5. Semsat
6. Serê Golan

### 10) Sêrt

1. Berwarî
2. Dih
3. Hewêl
4. Misriç
5. Şêrvan

### 11) Xarpêt

1. Axin
2. Baskîl
3. Depe
4. Keban
5. Meden
6. Miyaran
7. Pali
8. Qowancıyan
9. Sivrice
10. Xulaman

## II-ZEMÎR

### Zemîrê kesî (zemîrê şexsî)

Kirmanckî de di grûbî zemîrê kesî estê. Ma tiya de goreyê meylê kombiyayîşê nê di grûban nusene:

### Grûba yewine

1. ez
2. ti
3. o
3. a
1. ma
2. şima
3. ê


Meylê kombiyayîşê formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bîni zî estê.

meylê kombiyayîşê	formê bîni
2. ti	2. to, tû
3. o	3. ew, aw, we, wi, ay, yo, yû, wo

3. a 3. ya

2. şima 2. sima  
3. ê 3. yê, yî

# YHK: "Ma paştiya qerarê Mahkemaya Berlîni gênê"



Sekretrê Giştî yê PDK-Iranê Dr. Sadik Şerefkendi

**Y**ewbiyayena Huqûqzanê Kurd-Swêd, roja 11.04.1997'in di qerarê Mahkemaya Berlîni ser o belavokê vila kerd. Belavok di bi kilmeya behsê kiştina Dr. Sadik Şerefkendi û embazanê ci û roja 10.04.1997'in di bi qerarê Mahkemaya Berlîni ya mahkûmkerdina Serekê Komara Îranî Ayetullah Rafsanjanî û Wezîrê İstixbaratî Eli Fellehiyan yeno kerden û wina vajêno:

"Çi heyfo ki heta qerarê Mahkemaya Berlîni, dewletanê Awrûpa, dezgehê heqê insanî yê navnetewî, bi girêdayena menfeetê navnetewî yê dewletan, tewrê xu eşkere nêkerdbî. Labelê bahdê qerarê Mahkemaya Berlîni û tewrê dewleta Îranî yo ne huqûqî û ne insanî civerê dezgeh, sefaret û diplomatê Almanya; bahdê ki Almanya diplomatê Îranî yê terorîstî welatê xu ra vetî; dewletanê Yewbiyayena Awrûpa jî qerar gurot ki paştiya Almanya bigîrê, dewleta terorîst a Îranî mahkûm bikerê û tenya veradê. Netîceyê ney qerarî, diplomatê xu Îran ra antî û diplomatê Îranî jî welatê xu ra vetî."

Bahdê behsê karakterê karûbarê dewleta Îranî û reaksiyonê ci, belavok wina dewam kena:

"Ma, Yewbiyayena Huqûqzanê Kurd (YHK)-Swêd, qerarê Mahkemaya Berlî-

ni, zey qerarêno tarîxî; goreyê pîvanê umûmî yê huqûqo modern û demokratîk û navnetewî, bi edelat vînenê; qandê şarê ma jî serkewtenêna gird a. Qandê ney jî, ma YHK-Swêd paştiya qerarê Mahkemaya Berlîni gênê. No qerar do rojê vernî di kiştê huqûqî ra qandê şarê kurdî bibo emsalê. Eşkere bi ki têkoşînê şarê ma di, karê huqûqî jî meydanêno gird o.

"Ma ze YHK-Swêd hevî kenê ki qerarê dewletê Yewbiyayena Awrûpa, qandê alaqeyanê organîzasyonanê kurd û Kurdistanî bi Îranî ya jî bibo eynikê. Organîzasyonê Kurdistanî alaqeyê xu yê bi Îranî ya çim ra ravêrnê û alaqeyanê xu bi-birnê.

"Ze ki yeno zanayen kar û barê terorîstî yê komarê İslamî peynî minê. Nê çend rojê dimayin di casûsanê Îranî, minîtiqeya Şarbajêr di, wîlayeta Silêmaniye di, jahr dayo 60 pêşmerge û terefdarê PDK-Îranî. Halê înan xerab o. No kar jî raşterast civerê huqûqo navnetewî yo. Ma, YHK-Swêd, dezgehanê navnetewî yê insanî ra wazenê ki civerê na hedîse û karê bînî yê Îranî hertim vinderê û meyda bi kar biyarê."

## Derheqê Kirmanckî (Kirdkî) de Kombiyayîşê II. ê Stockholmî

### Grûba diyine

1. mi
2. to
3. ey
3. aye

1. ma
2. şima
3. înan

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

### meylê kombiyayîşî

1. mi
2. to
3. ey

3. aye

1. ma
2. şima
3. înan

jînî, îna, îne, îne, înu, aynan, eyna, ayno

Yew zemîro kesî zî xo yo. Frenskî de nê zemîrî ra pronom personnel réfléchi vajiyêno. Meylê kombiyayîşî formê xo yo, labelê tanî cayan de herûnda xo y de nê formî zî vajiyênê: xwe, xwi, xu, ho, hu.

### III-SIFET

#### Rengî

#### Kirmanckî (kirdkî)

sipî, sîs  
sûr  
siya, qer  
şalê, qeweyî  
kewe  
hewz, kesk, zergûn  
zerd, çequer

#### tirkî

beyaz, ak  
kırmızı  
siyah, kara  
kahverengi  
mavi  
yeşil  
sarı

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê. Nîmûne:

#### meylê kombiyayîşî

sipî  
sûr  
siya  
qeweyî  
kewe  
hewz  
zerd

#### formê bînî

sipe, sipê, sipye  
sur  
şiya, şa  
engê qehwî, rengê qawî  
kewo, kiho, kuhe, kûhe  
sewz  
zer, zerk

Mena tanî rengan ca ra ca ciya ya. Nîmûne:

kewe (kewo, kiho, kuhe, kûhe): Tanî cayan de yeno mena yeşil ê tirkî.  
zergûn: Tanî cayan de yeno mena hewzê zerdinî yan zî zerdbiyaye yî (bi tirkî saratî).  
zerd: Tanî cayan de yeno mena altın sarısı yê tirkî.

### IV-HÛMARÎ

Meylê kombiyayîşî nê hûmaran ser o yo:

- 11 yewendes
- 12 diwêş/duyes
- 13 hîrêş
- 14 çarêş
- 15 pancêş
- 16 şiyêş
- 17 hewtêş
- 18 heştêş
- 19 newêş
- 20 vîst
- 30 hîris
- 40 çewres
- 50 pancas
- 60 şeştî
- 70 hewtay
- 80 heştay
- 90 neway
- 100 se
- 200 di sey
- 300 hîrê sey
- 400 çar sey
- 500 panc sey
- 600 şeş sey
- 700 hewt sey
- 800 heşt sey
- 900 new sey
- 1000 hezar
- 1000 000 milyon
- 1000 000 000 milyar

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê zewbîna (sewbîna) formî zî estê:

#### meylê kombiyayîşî

11 yewendes des û jû, des û jew, yondes  
12 diwêş/duyes des û didi  
13 hîrêş des û hîrê  
14 çarêş des û çar, des û çihar  
15 pancêş des û panc,  
poncêş, pûncêş  
16 şiyêş des û şeş  
17 hewtêş des û hewt, hotêş  
18 heştêş des û heşt, heştêş  
19 newêş des û new  
30 hîris hîriş  
40 çewres çewreş, çores, çoras  
50 pancas pancas, pûncas  
60 şeştî şeşt, şest, şeştî, şeşt, şeştî  
70 hewtay hotay, hawtay, hotayê  
80 heştay heştayê, hêştayê, heştay  
90 neway newayê, noway  
500 panc sey pan sey, ponc sey, pon sey, pûn sey  
700 hewt sey hot sey  
800 heşt sey heyşt sey, hêşt sey  
900 new sey no sey  
1000 hezar henzar, hinzar, honzar, hünzar, hazar  
1000 000 milyon mîlun  
1000 000 000 milyar mîlar

Nîmûne:

1925 hezar û new sey û vîst û panc  
1938 hezar û new sey û hîris û heşt  
1997 hezar û new sey û neway û hewt  
1567849 yew milyon û panc sey û şeştî û hewt hezarî û heşt sey û çewres û new